The most important problem that the Shabaks have faced in their history has been the ISIS attacks. During the ISIS attacks that started in 2014, the Shabak community living in Mosul have been forced to flee the city due to kidnappings, killings and bombings. After capturing Mosul, ISIS distributed leaflets targeting the Shabaks, calling for their killing and displacement. As a result of ISIS attacks, 1,500 Shabak families fled Mosul. On August 11, 2014, ISIS issued a decree to kill Shia Shabaks and confiscate their property. As of August 22, according to an estimate reported by the Iraqi Press Agency, at least 3,000 Shabaks have lost their homes and hundreds have been killed (Human Rights Watch, 2009:37; Zoonen & Wirya, 2017). When Mosul, the main homeland of the Shabaks, was occupied by ISIS, the Shabaks sought refuge in Dohuk, Sulaymaniyah and Erbil. An estimated 1/3 of the Shabaks have been displaced (EPIC, 2019). The Shabaks estimate that around 1,500 Shabaks were killed in ISIS attacks, and hundreds more were held captive by ISIS. In addition, a small number of Sunni Shabaks appear to have joined ISIS. The Shabak community knows the identity of the Shabaks who joined ISIS. A large number of Shabaks have migrated outside Iraq due to ISIS attacks; however, they did not make mass migrations compared to other groups in Iraq, such as Christians and Yazidis. At most 200 families migrated during the ISIS attacks. The main reason why the Shabaks have not migrated is that they are not a community that is well accepted outside Iraq due to their beliefs (CRPME, 2016: 30).

The Shabaks suffered greatly under ISIS, who massacred them because they were not considered People of the Book. Because their ethnic identity (Turkoman, Arab, or Kurdish) was unclear, they became victims in regional ethnic conflicts (Mallon, 2017).

The Shabak community has also pursued political organization. The Free Shabaks Movement, established following the 2015 Iraqi law on political parties, represents the most prominent civil organization. In 2013, the Shabaks won one seat in the Ninewa Provincial Council. The Shabaks have 7,000 votes in Ninewa alone (EPIC, 2019). In the 2018 parliamentary elections in Mosul, one seat was reserved for the Shabaks, and three parties competed for this seat. These are: Free Shabak Movement, Democratic Shabak Assembly and an independent candidate named Qusai Abbas Mohammed. Qusai Abbas Mohammed received more than 14,000 votes, the Free Shabak Movement secured 7,000 votes and the Democratic Shabak Assembly around 6,900 votes. The winner, Qusai Abbas Mohammed, was supported by Hadi al-Ameri, the leader of the Badr Organisation, as well as a cleric named Hassan Sultan Fattah, who claims to be the representative of Iranian Supreme Leader Ali Khamenei in the region. The links with the Badr Organisation and the cleric helped Qusai Abbas Mohammed win votes from the Shabaks as they appealed to Shia religious sentiments (EPIC, 2019).

Today, there are still sectarian (Shia-Sunni) divisions and polarisations within the Shabak community. Politically, Sunni Shabaks support the Kurdish Regional Government of Iraq (KRG), while Shia Shabaks support the central government. Nevertheless, according to Shabak figures such as Dr. Hunain Mahmood Al-Qaddo and Husein Z. Ali al-Shabake, living in the KRG is more advantageous for the Shabak community in terms of freedom and democracy. Indeed, many Shabak families migrated to the KRG after 2014. The tendency toward militarisation within the Shabak community has led to the formation of autonomous militias due to the polarisation between the KRG and pro-Baghdad factions,

paving the way for inter-communal conflict and revenge crimes (CRPME, 2016:30-31).

The governance discussions for the Shabak community are carried out in three scenarios. The first is the establishment of an independent Shabak region; however, the Shabaks disapprove of this scenario. The second is the establishment of an autonomous Shabak region affiliated with the central Iraqi government; however, it is thought that this situation will increase the tension between Erbil and Baghdad and is economically unsustainable. The other proposal is autonomy under the management of the Kurdistan Regional Government (KRG), which is considered the most suitable option due to geographical harmony and past everyday experiences. However, this option does not guarantee peaceful living among the communities. In particular, the bitter experiences with ISIS make these initiatives impossible (CRPME, 2016:31-32).

4. Analysis and Evaluation

From a broader perspective, the Shabaks have historically found themselves at the intersection of major power struggles in Iraq due to both their geographic location and their religious-ethnic composition. Their presence in Mosul and surrounding areas has exposed them to challenges ranging from the Ottoman-Safavid conflicts to modern threats such as the Ba'ath regime and ISIS. Claims of a historical connection with the Qizilbash units loyal to Shah Ismail suggest that the Shabaks' identity was shaped, in part, by the religious tensions between the Ottomans and Safavids. In this context, historical analysis requires understanding the reasons behind transformations such as the Shabaks losing their military identity and their religious rituals adopting a more heterodox character over time. The post-Ottoman Iraqi monarchy and the Republican era caused the Shabaks to develop a tense relationship with the central authority. Traumatic events such as the Anfal operations and Arabization policies reshaped the demographic composition and settlement patterns of the Shabaks. The Shabaks possess a diverse linguistic and religious identity. An obvious indicator of their linguistic hybridity is the influence of Kurdish (Gorani or Hawramani dialect), Persian, Turkish and Arabic. In addition, the similarities between the Shabaki dialect and Zazaki and Hawrami are striking. In terms of religious beliefs, the Shabaks have rituals that blend Twelver Shi'ism and Bektâshî traditions. Practices such as observing the Muharram fast instead of the Ramadan fast and reciting Gûlbank prayers with spiritual leaders (pîrs) instead of performing formal prayers indicate similarities between Anatolian Alevism and the Shabaks' belief system. This distinction is a significant factor that sets the Shabaks apart from orthodox interpretations of Islam.

There are different theses about ethnic identity, such as the Shabaks being of Kurdish, Turkoman or even Iranian origin. This uncertainty has been exploited as a political tool by regional nationalist groups. The contested nature of their identity affiliations has paved the way for the Shabaks being marginalized and subjected to periodic assimilation efforts. The Shabak community faced severe oppression under the Ba'ath regime, one of the most challenging periods in Iraq's history. Under Saddam Hussein's Arabization policies, the Shabaks were subjected to systematic pressure to abandon their ethnic identity. The 1987 census serves as the most concrete example of this oppression, as the Shabaks were only given the option to register as either Kurds or Arabs. Those identifying as Kurds were exiled to Peshmerga-controlled zones, while several Shabak villages were burned and destroyed. The Anfal Operations in Iraq in 1988, which involved the use of chemical weapons, witnessed large-scale human rights violations. Alongside Kurds, Assyrians, and Turkomans, the Shabaks were also

targeted in this genocidal campaign. This period left deep socio-psychological scars on the Shabak community. The Shabaks have been compelled to navigate shifting political allegiances in modern Iraqi history. The Arabization policies of the Ba'ath regime and the genocidal attempts of ISIS have exacerbated the Shabak's struggle to survive. The hardships faced by thousands of Shabak families forced to flee Mosul during the 2014 ISIS attacks in particular reveal the impact of Iraq's security and stability problems on the Shabak.

The 2014 ISIS occupation of Mosul marked the beginning of another devastating period for the Shabak. Shia Shabaks were specifically targeted and subjected to kidnapping, killing and forced migration. In the threatening leaflets distributed by ISIS, the Shabaks were described as "apostates" and threatened with death. During this period, more than a thousand Shabak families were forced to flee Mosul, hundreds of Shabaks were killed, and hundreds were taken captive. The claim that some Sunni Shabak joined ISIS further divided the community. However, these participations were ostracised and condemned by the Shabak community. The Shabak's reluctance to migrate stems from their lack of acceptance by societies outside Iraq and the challenges posed by their religious differences in new environments.

In an attempt to overcome issues with political representation, the Shabaks have sought to participate in the Iraqi Parliament by establishing political parties since 2015. Nevertheless, sectarian divisions and Kurdish-Arab tensions have further fragmented the community. Notably, Sunni Shabaks support the KRG, while Shiite Shabaks back the central government. One prominent proposal for Shabak autonomy is an administration under the KRG. However, this situation carries the potential for conflict due to the competition for territory and population in the region.

On the other hand, while the Shabaks had limited political representation in the past, they have become more politically active since 2015. The Sunni Shabaks' alignment with the KRG has prompted Shia Shabaks to back the central government, intensifying political polarisation. Sunni Shabak's pro-KRG stance has forced the Shiite Shabaks to back the central government, deepening political polarisation within the community.

Conclusion

This research, grounded in the literature review, examines the Shabaks as an ethno-religious community in Iraq. A holistic evaluation of the research data indicates that like other Iraqi minority groups such as Assyrians, Armenians, Kakeyi, and Fayli, the Shabaks strive to sustain their existence primarily through their religious beliefs. The Shabak community has endured attacks, massacres, and forced migrations under periods of political instability in Iraqi state. Although precise information regarding their initial settlement in Iraq and their ethnic origins remains unclear, existing evidence suggests that the Shabaks may have Kurdish, Turkish, or Iranian roots. More than their ethnic background, it is their religious identity religious that unites the Shabak community and serves as the primary source of cohesion. The Shabaks follow variants of the Shiite sect of Islam, including Kizilbash and Alevi. Although their beliefs led the Shabaks to be perceived as the 'other' during the Ba'ath regime, they endeavoured to preserve their religious identity. Following the collapse of the Ba'ath regime, Shabaks residing both within the Kurdistan Regional Government (KRG) and under the central Iraqi government have increasingly gained political visibility. Despite enduring numerous adversities, the Shabak community continues to survive within Iraq's complex religious and ethnic landscape, striving to transmit this heritage to future generations.

References

Abdulhadi, M. (2017). *El-şebek fi'l Iraq*. Master Tezi, Kadisiye Üniversitesi Eğitim Fakültesi, Iraq.

- Al Lami, M. (2014). Iraq: The minorities of Nineveh. *BBC News*, erişim: 26.12.2024. <https://www.bbc.com/news/world-middle-east-28351073>.
- Bruinessen, V. M. (1998). *A Kizilbash community in Iraqi Kurdistan: The Shabak*. Les annals de l'autre Islam 5.
- Bruinessen, V. M. (2005). *Kürtlük, Türklük, Alevilik: etnik ve dinsel kimlik mücadeleleri* (6. Baskı). H. Yurdakul (Çev.), İletişim Yayınları.
- Centre for Religious Pluralism in the Middle East (CRPME). (2016). Untying The Knots Of Religious Diversity In Iraqi Kurdistan: Deploying Pluralism Against Barbarism II, Special Report. <https://cemmis.edu.gr/index.php/publications/crpme-reports/item/609-crpme-special-report-no-2-untying-the-knots-of-religious-diversity-in-iraqi-kurdistan-deploying-pluralism-against-barbarism>
- Dehqan, M. (2008). A Shabak contemporary polemic against the Yezidi religion. *Oriente Moderno*, 88 (1), 200–204.
- Edmonds, C. J. (1967). *A pilgrimage to Lalish*. Cambridge: The Royal Asiatic Society of Great Britain and Ireland, The University Press.
- Enabling Peace İn İraq Center (EPIC). (December 13, 2019). Iraq's Shabaks and the search for land rights and representation. Safe Return, an interview with Hussein al-Shabaki, a member of the Free Shabaab Movement, conducted by EPIC.
- Human Rights Watch (1995). *Iraq's crime of genocide: The Anfal campaign against the Kurds*. New Haven: Yale University Press.
- Human Rights Watch (2009). On Vulnerable Ground – Violence Against Minority Communities in Nineveh Province's Disputed Territories. New York, USA.
- Kakeî, H. (2014). *Mewlûdnamey peyghember bi zarawî Shebek*. Duhok: Enstîtûya Kelepûrê Kurdî.
- Kreyenbroek, P. & Omarkhali, K. (2021). Kurdish religious minorities in the modern world. h. bozarslan, C. Güneş ve V. Yadırgı (Ed.), *The Cambridge History of the Kurds*. Cambridge: Cambridge University Press, 707-728ç doi:10.1017/9781108623711.029
- Leezenberg, M. (1994). The Shabak and the Kakais: Dynamics of ethnicity in Iraqi Kurdistan. ILLC – Department of Humanities, University of Amsterdam.
- Leezenberg, M. (2014). The end of heterodoxy? The Shabak in post-Saddam Iraq. *Studies in Oriental Religions*, 68, 247-268.
- Leezenberg, M. (2018). Transformations in minority religious leadership: The Yezidis, Shabak, and Assyrians in Northern Iraq. *Sociology of Islam*, 6(2), 233-260. <https://doi.org/10.1163/22131418-00602005>
- Mallon, E. D. (2017). Connections: Religious minorities in the middle: Shabak. Ph.D Thesis, *CNEWA*. <https://cnewa.org/cnewa-connections-religious-minorities-in-the-middle-east-part-2-the-shabak-53928/>
- Middle East Watch (MEW) (2003). *Irak'ta soykırım: Kürtlere karşı yürütülen enfal askeri harekâtı*. Human rights watch departmanı, Ü. Aydoğmuş (Çev.), Avesta Yayınları.
- Moosa, M. (1987). *Extremist Shiites: The ghulat sects*. Syracuse University Press.
- Omarkhali, K. (Ed.) (2014). *Religious minorities in Kurdistan: Beyond the mainstream*. Studies on oriental religions, Otto Harrassowitz GmbH & Co. KG, Wiesbaden.
- Sykes, M. (1908). The Kurdish tribes of the Ottoman Empire. *The Journal of the Royal Anthropological Institute of Great Britain and Ireland*, (38), 451–486.
- Taşğın, A. (2009). Irak'ta Bektaşî topluluğu Şebekler. *Türk Kültürü ve Hacı Bektaş Veli Araştırma Dergisi*, (52), 127-143.
- Zoonen, V. D. & Wirya, K. (2017). The Shabaks: Perceptions of reconciliation and conflict. Middle East Research Institute (MERI) Report. <http://www.jstor.org/stable/resrep13631>
- Vinogradov, A. (1974). Ethnicity, cultural discontinuity and power brokers in northern Iraq: The case of the Shabak. *American Ethnologist*, 1(1), 207–18.

Engin KORKMAZ

A Minority at the Intersection of Religious and Ethnic Identities in Iraq: Shabaks

Zeki Beg, M. E. (2018). *Kürtler ve kürdistan tarihi* (11. Baskı). V. İnce, M. Dag, R. Adak ve Ş. Aslan (Çev.), Nûbihar Yayınları.

Hêmanên Mîtik di Romana Hesar û Kûçikên Bavê Min ya Şêrzad Hesen de*

Şêrzad Hesen'ın Hesar û Kûçikên Bavê Min Romanındaki Mitik Unsurlar

Mythical Elements in Şêrzad Hesen's Novel Hesar û Kûçikên Bavê Min

Mesut CANDAN

<https://orcid.org/0000-0002-6209-7771> | mevsimsiz_kar09@hotmail.com

Xwendekarê Doktorayê, Zanîngeha Bingolê, Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê, Beşa Ziman û Edebiyat Kurdi

ROR ID: <https://ror.org/03hx84x94>

M. Zahir Ertekin**

<https://orcid.org/0000-0003-3519-9892> | zahirertekin@hotmail.com

Prof. Dr. Zanîngeha Mardin Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdi

ROR ID: <https://ror.org/0396cd675>

Jêgir Citation Atıf	Candan, M.& Ertekin, M. Z. (2025). Hêmanên mîtik di romana <i>Hesar û Kûçikên Bavê Min</i> ya Şêrzad Hesen de. <i>Artuklu Kurdology</i> (20). 29-44 https://doi.org/10.35859/artuklukurdology.1758461
Dîroka Şandinê Submission Date Geliş tarihi	04.08.2025
Dîroka Qebûlê Acceptance Date Kabul Tarihi	28.09.2025
Dîroka Weşandinê Publication Date Yayın tarihi	30.09.2025
Cureyê Gotarê Article Type Makale Türü	Gotara vekolinê Research article Araştırma makalesi
Hakemî Peer-Review Hakemlik	Cot Nenas – Du ji derve Double anonymized - Two External Çift Taraflı Kör Hakemlik – İki hakem
Beyana Etîk Ethical Statement Etik Beyanı	Hatîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsina vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etîk hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin. Ragihandina Etîkê: jms@artuklu.edu.tr . It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited. Ethical notification: jms@artuklu.edu.tr Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir. Etik Bildirim: jms@artuklu.edu.tr
Kontrola İntihalê Plagiarism Check Benzerlik Kontrolü	Belê – İntihal.net Yes – İntihal.net Evet – İntihal.net
Nakokiyên Berjewendîyan Conflicts of Interest Çıkar Çatışması	Di gotarê de di navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendîyê tune ye. There is no conflict of interest between the author and any parties in the article. Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.
Tevkarîya Nivîskarên Author Contribution Yazar Katkı Oranı	Nivîskarê yekem %75 nivîskarê duyem %25. First author %75, second author %25. Birinci yazar %75, ikinci yazar %25.

* Derginin Editör Kurulu'nda yer alan yazarın editör rolü bu sayı için askıya alınmış ve kendisi bu makalenin değerlendirme süreçlerinde herhangi bir rol almamıştır.

** Ev gotar ji teza Mesut Candan a ku li Zanîngeha Bingolê Enstîtûya Zimanên Zindî di bin şewirmendiya Prof. Dr. Zahir Ertekin de bi serenavê “Mît û Roman: Dîmena Edebî ya Mîtan di Romana Kurdî de (1990-2021) / Mit ve Roman: Kürt Romanında Mitlerin Edebi Görünümü (1990-2021)” tê amadekirin hatiye hilberandin.

Alîkarîya Darayî <i>Grant Support</i> Maddî Destek	Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine. <i>The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.</i> Yazar(lar), bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.
Mafê Telifê & Destûr <i>Copyright & License</i> Telif Hakkı & Lisanslama	Nivîskar li jer lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin. <i>Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0.</i> Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.
Politikaya Hişê Çêkirî <i>AI Policy</i> Yapay Zeka Politikası	Nivîskar beyan dîkin ku di nivîsîna gotarê de alîkarîya HÇ wernegirtiye. <i>The author(s) declares that they have not used AI in producing this paper.</i> Yazar(lar) bu makalenin yazım aşamasına YZ kullanmadıklarını beyan eder.
Agahîyên Îndeksan <i>Indexing</i> Dizinleme Bilgisi	DOAJ, MLA, ErihPlus, Linguistic Bibliography, EBSCO, ProQuest

Kurte

Mît ew vegêranên herî kevnare yê mirovahîyê ne ku di derhişa kolektîf a mirovahîyê de pêk hatine. Ji serdemên kevnare heta îro mîtan, bi saya binyada xwe ya arketîpîk di gelek cureyên vegêranê yê edebî de cih girtine. Ji destan û efsaneyan heta çîrok û romanên di gelek cureyên edebî de em rastî hêman û taybetîyên mîtîk tên. Di berhemêke edebî de hebûn û bikaranîna mîtê, tenê bi armanca xemilandina berhemê nayê kirin. Nivîskarek wexta ku sûd ji mît û mîtolojîyan werdigire, armanca dike ku temas li hest û ramanên neguher ên mirovahîyê bike. Tirs û xof, daxwaz û arezû, lej û pevçûn, berberî û hestên wek van ên mirovan bi rêya hêmanên mîtîk derfeta îdraqkirin û watadarkirinê dibînin. Ev gotar armanca dike ku hêmanên mîtîk ên ku di romana Şêrzad Hesenî *Hesar û Kûçikên Bavê Min* de cih digirin, nîşan bide. Di vê romanê de hin rûdan û diyarde dişibin mîta Oîdîpusî. Arezûyên libîdînal, têkilîya ensestê, kuştina bav, têkilîyên îqtidarî û tundûtujîya derûnî û fîzîkî yê di romanê de cih digirin, mijarên sereke û bingeîn ên mîta Oîdîpusî ne. Ji ber vê jî di vê gotarê de dê sûd ji girêka Oîdîpusî ya Freudî bê wergirtin da ku hêmanên mîtîk yê romanê derkevin meydana. Di vê gotarê de di destpêkê de pênase û taybetmendiyên mîtê hatine ravekirin. Piştî wê behsa têkilîya mît û psîkolojîyê û rêbaza psîkanalîzê hatiye kirin. Herî dawî roman bi rêya rexneya psîkanalîzê ji aliyê hebûna hêmanên mîtîk ve hatiye nixandin.

Peyvên Sereke: Mît, Roman, Girêka Oîdîpusî, Şêrzad Hesen, *Hesar û Kûçikên Bavê Min*.

Xalên Sereke

Mît vegêranên derhişîyê yê herî kevnare ne ku ji serdemên bere hey aroja me di cureyên edebî de hebûna xwe berdewam kirine.

Di vê xebatê de mît ji bo temasa fikrî û hestên mirovan ên neguherbar hatine bikaranîn.

Di romana Hesar û Kûçikên Bavê Min de hêmanên mîtîk ên wekî mîta Oidipus hene. Ew hêman bi rêbaza psîkanalîzê ve hatine vekolîn.

Di gotarê de li ser pênaseya mîtê, têkilîya mît û psîkanalîzê û rêbaza psîkanalîzê tê rawestan û roman di wan peywendan de tê vekolîn.

Öz

Mit kolektif bilinç dışında meydana gelen, insanlığın en eski anlatılarından. Arkaik dönemlerden

günümüze kadar mit, arketip yapısı sayesinde birçok edebi anlatı türünün içinde yer almıştır. Destan ve efsanelerden hikâye ve romanlara kadar birçok edebi türde mitlerin özellikleri ve unsurlarına rastlamak mümkündür. Bir edebi eserde mitin varlığı ve kullanımı sadece eseri süsleme niyetiyle yapılmamaktadır. Bir yazarın mit ve mitolojiden yararlanması, insanlığın değişmez duygu ve düşüncelerine temas etmesi amacıyla yapılır. İnsanların korku, istek, kavgâ ve çatışma gibi duyguları mitik unsurlar yoluyla idrak edilir ve anlamlandırılır. Bu makalede *Hesar û Kûçîkên Bavê Min* romanında yer alan mitik unsurların gösterilmesi amaçlanmıştır. Bu romanda yer alan bazı olay ve olgular Oidipus mitiyle benzerlik göstermektedir. Romanda yer alan libidinal arzular, ensest ilişkisi, baba katli, iktidar ilişkileri ve fiziksel ve ruhsal şiddet gibi konular Oidipus mitinin temel konularındandır. Bu sebeple romanın mitik unsurlarını meydana çıkarmak amacıyla Sigmund Freud'un Psikanaliz yönteminden faydalanılacaktır. Bu makalede ilkin mitin tanımı ve özellikleri üzerinde durulacaktır. Ondan sonra mit ve psikoloji ilişkisi ve psikanaliz yöntemden bahsedilecektir. Son olarak roman mitik öğelerin varlığı açısından psikanaliz yöntemden faydalanılarak değerlendirilecektir.

Anahtar Sözcükler: Mit, Roman, Oidipus Kompleksi, Şêrzad Hesên, *Hesar û Kûçîkên Bavê Min*.

Öne Çıkanlar

Mitler, arkaik dönemlerden günümüze kadar edebî türlerde varlığını sürdüren kolektif bilinçdışının en eski anlatılarıdır.

Bir eserde mitin kullanımı, insanlığın değişmez duygu ve düşüncelerine temas etmek amacıyla yapılır.

Hesar û Kûçîkên Bavê Min romanında Oidipus mitine benzer mitik unsurlar bulunmakta ve bu öğeler psikanaliz yöntemiyle incelenmektedir.

Makalede mitin tanımı, mit-psikoloji ilişkisi ve psikanaliz yöntemi üzerinde durularak roman bu bağlamda değerlendirilecektir.

Abstract

Myths are the oldest narratives of humanity, existing in the collective unconscious. From archaic times to the present, myth has been included in many literary narrative genres due to its archetypal structure. Features and elements of myths can be found in various literary genres, from epics and legends to stories and novels. The presence and use of myth in a literary work are not merely for decoration. An author's use of myth and mythology aims to address the unchanging feelings and thoughts of humanity. Human emotions such as fear, desire, struggle, and conflict are understood and interpreted through mythic elements. This article aims to reveal the mythic elements in the novel *Hesar û Kûçîkên Bavê Min*. Some events and phenomena in this novel resemble the Oedipus myth. Issues such as libidinal desires, incestuous relationships, patricide, power relations, and physical and psychological violence are among the main subjects of the Oedipus myth. For this reason, Sigmund Freud's psychoanalytic method will be used to reveal the mythic elements in the novel. In this article, the definition and characteristics of myth will first be emphasized. Then, the relationship between myth and psychology, as well as the psychoanalytic method, will be discussed. Finally, the novel will be evaluated using the psychoanalytic method to examine the presence of mythic elements.

Key Words: Myth, Novel, Oedipus Complex, Şêrzad Hesên, *Hesar û Kûçîkên Bavê Min*.

Highlights

Myths are the oldest narratives of the collective unconscious and have continued to exist in literary genres from archaic times to the present.

The use of myth in a literary work aims to address the unchanging emotions and thoughts of humanity.

In the novel *Hesar û Kûçikên Bavê Min*, mythical elements resembling the Oedipus myth can be found and are analyzed through the psychoanalytic method.

This article focuses on the definition of myth, the relationship between myth and psychology, and the psychoanalytic method, evaluating the novel within this framework.

Destpêk

Mît ew vegêranên sembolîk û arketîpîk in ku ji derhişa hevpar dizên û tê de agahî û zanînen bîra çandî veşartî ne. Di tevahîya dîrokê de mît hem bûne hîma edebiyata devkî û nivîskî hem jî wek embara agahî û zanînen dema berê, karîgerî li cureyên edebî yên modern kirine. Di mîtan de em ne tenê çîrokên berê hîn dibin; di heman demê de hînî tirs, arezû û berberîyên ferd yan civakê yên ku ji derhişa kolektîf dizên, dibin. Ji ber vê jî mirov dikare vê yekê bîne zimên ku mît wek binyadekê di teşegirtina hest û ramanên mirovahîyê de erk û rolên bingeşîn digirin ser xwe. Edebiyat jî ji vê binyadê sûd werdigire û bi veguherandina hin hêmanên vê binyadê dixwaze tiştekî nû ava bike. Herwiha Subaşi dest nîşan dîke “edebiyat yek ji wan mecrayan bûye ku gelek metafor, sêwirîn û sembolên tê de li ser mîtan hatine danîn. Ne xerîb e ku meriv bibêje kanake îlhama edebî mît bûne an jî edebiyat bixwe bûye qadeke temsîl û tezahura mîtan” (Subaşi, 2022, r.84). Bi gotîneke din edebiyat mîtan wek hêmaneke avaker dibîne ku kûrahîya sembolîk û ramanî ya berhemê li ser wê ava dibe. Bi vî awayî mît ji çavkanîya vegêranê wêdetir dibe hêmaneke avaker a berhema modern. Bi taybetî di romanên modern de, vegêranên ku dixwazin dinyaya hindurîn a ferdan nîşan bidin, sûd ji motîfên mîtîk werdigirin û bi rêya analîzên derûnî, tebeqeyên watayê yên berhemê dewlemendtir dikin. Bi vê peywendê mirov dikare bibêje ku mît, psikolojî û edebiyat sûd ji hev werdigirin. Bi taybetî xebatên Sigmund Freudî yên li ser mîtan hatiye kirin û rêbaza wî ya psikanalîzê di derxistina watayên kûr yên berhemê de bandordar in. Bi taybetî girêka Oîdîpusî, di analîza berberîyên nav malê, pêpeskirina arezûyên libîdînal, tirs, qedexa û tetmînê de wek rêbazeke bihêz derdikeve pêş. Di nêrîna psikanalîz a Freudî de, mîta Oîdîpusî tenê vegêraneke kevnare nîne. Wî di bin vê vegêranê de hin rewşên derûnî tespît û şîrove kirine ku di pêvajoya gihaştina mirovan de tîrî dîtin. Teorîya wî piştî wek rêbazeke li ser berhemên modern hatiye sepandin. Bi taybetî di wan berheman de ku mijar li ser berberîya bav û kur, arezûyên libîdînal û hestên xwesûcdardîtîne ne, ev rêbaz hatiye bikaranîn.

Romana Şêrzad Hesên ya bi navê *Hesar û Kûçikên Bavê Min*, ji aliyê hin motîfên mîtîk ve dişibe mîta Oîdîpusî. Arezûyên libîdînal, tundûtûjîya derûnî û fîzîkî, berberîya bav û kur, tîkiliya enesetê, kuştina bav û tîkilîyên îqtidarî babetên hevpar ên herdu vegêranan in. Ev yek jî bi rêya rêbaza psikanalîzê derfeta nîrxandina vê romanê dide. Bi vê peywendê armanca vê gotarê ew e ku hêmanên mîtîk ên romanê bên nîşandan û bi rêya rêbaza psikanalîzê ev roman bê analîz û şîrovekirin. Bi vê armançê em ewilîn li ser pênasîya mîtê radiwestin û taybetmendîyên wê yên sereke nîşan didin. Piştî em li ser tîkilîya mît û psikolojîyê disekînin û derbarê girêka Oîdîpusî de behsa hin agahîyên sereke dikin. Herî dawî jî em romanê ji aliyê hêmanên mîtîk ve dinîrxînin.

1. Mît û Taybetmendîyên Wan

Ji serdema Yewnana Antîk heta roja îro mît ji aliyê gelek bergehên cuda ve hatiye pênasîkirin. Her pênasî aliyekî mîtê li ber çavan girtiye û li ser wî aliyê rawestiyaye. Ji ber vê sedemê tê dîtin ku

di literatura zanistê de gelek pênaseyên ciyawaz ên mîtê li ber çavan dikevin. “Her pispor li gorî qada xebata xwe, hewl dide ku mîtose pênase bike” (Vali, 2022, r. 19). Ev yek jî wisa dike ku mirov nikaribe pênaseyeke tekûz a mîtê bi dest bixe.

Di eslê xwe de mît, ji reha mythosê tê ku ji zimanê yewnanî ye. Di zimanê yewnanî de ev peyv bi maneya gotinê hatiye bikaranîn û ji vê peyvê qest û mebest vegêrana çirokan e. Peyvên ku tên gotin û bihistin di nav mîtê de bi cih dibin ku ji bo vegêrana çîrçîrok, çîrok û efsaneyan jî ev peyv tê tercîhkirin (Erhat, 2021, r. 5).

Filozofên qedîm li ser wataya mîtan hûr bûne û bi bergehên cuda rexne li mîtan kirine an jî derbarê wan de hin şiroveyên xwe anîne zimên. Rexneyên ku li mîtan hatine kirin bêtir li ser mîtografan e ku mirov dikare wan wek berhevkarên mîtan bibîne. Li gorî filozofên qedîm, mîtografan di veguhestina mîtan de sûd ji qalibên helbestan werdigirin û bawerî bi veguhestina mîtan tînin; lêbelê di kêliya veguhestinê de gelek caran bi azadane tevdigerin û tiştên ku di çirokan de nînin, lê zêde dikin. Ji xeynî lêzêdekirin û midaxaleyên çîrokên mîtan, rexneyeke din jî li ser têgihîştin û feraseta mîtografan e. Li gorî filozofan, mîtograf xwedan kapasîteyeke rewşenbîrîyê nînin û nikarin rastîyên dinyayê fam bikin. Ji ber ku di warê krîtîkkirinê de şîyan û behreya wan kêmtir in, nikarin rastîyê bînin zimên. Ji ber vê yekê jî ji aliyê wan ve bikaranîna keresteyên mîtîk karekî bi talûke ye (Honko, 2014, r. 147; Batuk, 2009, r. 33).

Ji xeynî rexneyan gelek şiroveyên ciyawaz jî di serdema Yewnana Antîk de li ser mahiyeta mîtê hatine kirin. Li gorî nêrînekê mît, zanista civakên primitîf e û mirov dikare wê wek zanista berîya zanistê bibîne. Hin caran fenomenên xwezayê bi xwedawendan re tên tekildarkirin ku mît jî li ser van hêmanan çêbûne. Bi kurtî ax, hewa, ba û agir her yek ji van navê xwedawendekî ye: Wek mînak Posedion, av e. Teybetmendîyên ruhanî yên mirovan jî bi awayekî alegorîk hatine şirovekirin. Her xwedawend an îzedbanûyek di eslê xwe de taybetmendîyeke ruhanî ya mirovan nîşan dide. Zanabûn, hakîmbûn, arezû, hişmendî, îdraq û taybetîyên wek van xwe di kesayetîya xwedawend an îzedbanûyekê de nîşan didin. Di nav van şiroveyan de yek jî li ser etîmolojîyê ye. Li gorî vê nêrînê nav û wesfên xwedawendan, dikarin hin razên xwedawendan eşkere bikin. Her nav an wesfa xwedawendekî etîmolojîya peyvekê nîşan dide. Wek mînak etîmolojîya navê Apolloyî du peyv in: Hilweşandin û belavkirin. Ji xeynî van şiroveyan, şiroveyên ku li ser kok û jêdera mîtan rawestiyane jî derketine. Li gorî nêrînekê jêdera çîrokên mîtan, çand û şaristaniyên cuda ne. Bi saya têkilîyên ciyawaz, xwedawend û mîten çandên cuda di nava mîten yewnanan de bi cih bûne ku ji vê nêrînê re şiroveya dîrokî jî tê gotin. Li gorî nêrîneke din jî çavkanîya mîtan kesayetî û rûdanên dîrokî ne. Bi demê re kesayetîyên giring ên welatan wek xwedawend di mîten wan de cih girtine. Yanê çîrokên jiyana wan, bûne mîten wan. Di lîteraturê de ji vê şiroveyê re nêrîna Euhemerîstîk jî tê gotin. Hin caran mît bi bergeha sosyolojîk yan jî psîkolojîk hatine şirovekirin. Di şiroveya sosyolojîk de mît îcada wan kesan e ku desthilatdarên civakê ne. Bi armanca parastina pergala civakê kesên wek rahîb, hakîm û qanûnçêker mît çêkîrîne da ku bi tirs û xofê civaka xwe bi rê ve bibin. Helbet di vê yekê de daxwaza bihêzîkirina hikmên desthilatdar jî rolên sereke dilîzin. Di nêrîna psîkolojîk de jî tîrsa birçîbûn û xelayê berê mirovan ber bi mîtan kiriye. Bawerkirin an jî îbadetîkirin ji bo berterefîkirina birçîbûn an xelayê tê kirin. Yanê îbadeta wan ji bo nêçîr an mehsûleke baş e (Honko, r. 147-148).

Di serdema modern de jî li ser mîtê pênaseyên curbicur hatine kirin. Her şaxa zanistê mît li gorî bergeh û cihanbînîya xwe pênase kirine. Li gorî Robert A. Segal, mît li ser sê pîrsên sereke tên vekolan: Kok, tema û erk. Di xebatên sedsala nozdehem de li ser koka mîtan xebat hatine kirin ku bala van xebatan li ser tespîtîkirina jêdera mîtê ye. Mît bi çi şeweyî derketiye, xala nîskoka van xebatan e. Di sedsala bîstem de xebatên li ser mîtê, berê xwe didin tema an jî erkê. Wexta ku tema tê gotin, divê bala mirovan li ser kirdeyê mîtê be. Kirde jî di çîroka mîtîk de xwedawend in. Di xebatên li ser temayê de jî tê dîtin ku çîrokên mîtîk yan rasterast yan jî bi awayekî sembolîk tên xwendin. Di xwendinên sembolîk

de kirde diguherin. Di serdema modern de xebatên ku hemû aliyên mîtê li ber çavan digirin, kêman in (Segal, 2004, r. 11).

Li gorî pênaseyeke dîtir mît ewilîn çirok e, ji bo ravekirina dinya û gerdûnê hewleke primitîf e, hilberînen fantaziya helbestan e ku xelet hatine fêmkirin, di şewandina ferdî bo civakê de wek embara zanînan e, şeweyekî çanda devkî ye û mijara wê kozmolojî ye, sîtava pêvajoyên xwezayê ye, pesendkirina hin bawerî û rastîyên civakî ne, şewqa hin arezûyên derhişê ne, bi encama hin endîşeyan hatine çêkirin, hin raveyên derhişa kolektîf in, ji rewşên taybet ên dinyayê re hin bersiv in, wek sîstema pergala civakê ne, çirokeke pîroz û rastîn e, jinûvesazkera jiyana normal e, rabirdûyeke xuliqîner e, mît xwedan binyadeke giştî ne (Kirk, 2014, r. 155; Campbell, 2021, r. 338; Goody, 2017, r. 65; Segal, 2004, r. 13).

Li gorî Mircea Eliadeyî mirov nikare pênaseyeke bibîne ku ji aliyê herkesî ve were pejirandin. Her pênaseya mîtê dê hin aliyên wê paşguh bike yan jî dê ji mirovan re xerîb bê. Lewma ew pêşniyaz dike ku divê mît ji aliyê gelek bergehên cuda ve bê vekolan û şirovekirin da ku rastîyên wê yên tevlihev eşkere bibin. Ew mîtê wiha pênase dike:

“Mît çirokeke pîroz vedibêje; di dema herî kevin de, ‘di destpêkê de’ bûyereke vedibêje ku di demeke çirçîrokî de qewimiye. Bi gotineke din mît, bi saya serkeftinên Heyînen Sersirûştî, çî wek bêkêmanî hemû rastî yanê kozmos be, çî jî tenê parçeyekî wê (serêqisê giravek, tewrek nebatê, tevgerê mirovan, sazîyek) be, tîne zimanî ku çawa derbasî jiyanê bûye. Nexwe mît, her wext çirokeke ‘xulqandinê’ ye: Vêya vedibêje ku tiştek çawa hatiye xulqandin, çawa dest bi hebûnê kiriye. Mît ancax behsa vê dike: Tiştê ku bi rastî bûye qewimiye û bi temamî derketiye holê. Kesayetiyên mîtan Heyîneyên Sersirûştî ne. Bi taybetî bi vê tînen naskirin ku di destpêkê de di wê dema bêhempa de tiştan çêdikin. Nexwe mît, çalakîya xwe ya afirîner derdixe meydana û pîrozbûna (yan jî bi tenê taybetîya sersirûştîbûna) tiştên ku çêdike, dide ber çavan. Wek encamê, mît êrîşa cihêreng, carinan jî dilhejok, a tiştê pîroz (yan jî sersirûştî) dide teswîrkirin. Aha ev êrîşa pîroz e ku dinyayê bi rastî saz dike û wêya tîne rewşa ku îro tê de ye” (Eliade, 2001, r. 15-16).

Hiş û derhiş xala nîskokê ya pênaseyên mîtê yên psîkolojîk pêk tînin û li gorî wan mît li derhişê tînen hilberîn. Ji ber ku xewn û nexweşîyên derûnî jî li derhişê pêk tînen, ew bi mîtan re têkildar dibin. Hevparîya temayên mîtan jî ji vê yekê tê ku ruhê mirovan naguherin. Arketîp ango îmajên ewil ên mirovahîyê, di teşedana serborî û binyadên derûnî yên civak û ferdan de erkeke bi cih tînin. Ji ber vê yekê jî di pênaseyên mîtê yên psîkolojîk de zimanê sembolê cihekî giring digire. Digel vê yekê pênaseyên psîkolojîk li ser rêwitiya hundirîn, dinyaya derûnî û bitûniya ferdan in (Segal, 2004, r.10).

2. Têkilîya Mît û Psîkolojîyê û Girêka Oîdîpusî

Mît hêmaneke sereke ye ji bo têgihîştina mirovan ya derbarê xwe û gerdûnê de. Bala psîkolojîyê jî li ser tevger û reftarên mirovan e û dixwaze sedemên tevger û reftarên mirovan hîn bibe. Di lêkolînên psîkolojîk de peyda kirina faktorên ku di bin tevger û reftarên mirovan de cih digirin, armanca sereke ye. Bi vî awayî mît jî psîkolojî jî nêzî mirovî dibin da ku hemû tiştên têkildarî wî hîn bibin. Bi saya têkilîyên mît û psîkolojîyê mirov dikare derbarê ziman, edebiyat, çand, dîrok û hwd. de agahiyên biqîmet bi dest bixe. Wek rêbazekê armanca psîkanalîzê jî ew e ku dinyaya derûnî û pêvajoya derhişa mirovî bizanibe. Ew li ser mîtan dixebite da ku sedemên tevger û reftarên mirovan bîn nîşandan.

Cewhera hemû teorîyên mîtê yên psîkanalîtîk, li ser angaştê sembolîkbûna mîtê ye. Di teorîya psîkanalîtîk de hemû tema û mijarên hevpar di eslê xwe de berhemên derhişê ne; lêbelê peyda kirina materyalên derhişê ne hêsan in û bi rehetî dernakevin asta hiş. Lêkolerê ku dixwaze van materyalan bi dest bixe, divê hay ji sembolên derhişê hebe, da ku wan derxîne asta hiş (S. Cohen, 2014, r. 164). Ji ber vê yekê wexta ku mîtek tê analîzkirin, bala psîkanalîst li ser zimanê sembolîk ê berhemê ye.

Peydakirina watayên sembolên ku di rêzebûyera mîtê de derbas dibin, di navenda xebatên wan de cih digirin.

Temasa rasterast a mîtê ya bi qada psikolojiyê re bi xebatên Sigmund Freudî dest pê dike ku ew him bingeha teoriya psikanalîtîkê datîne him jî mîtê dixwe nava teoriya xwe (Küçükcoşkun, 2016, r. 59). Mîta Oîdîpusî hîma xebatên wî yê psikolojîk pêk tîne. Xebatên wî li ser xewn û mîtan in ku hin aliyên wan ên ku dişibin hevudin bala wî kêşaye (Segal, 2004, r. 123). Ew di xebatên xwe de balê dikşîne ser fanteziyên veşartî yê dema zarokatîyê û li gorî wî di çêbûna mît, çîrokên perîyan û pêkenokan de bandora van fantaziyan heye (Hikmet, 2016, r.51). Di vê derê de qedexa û astengkirin cihekî muhîm digirin, bi taybetî qedexa û tabûyên têkilîyên ensestî dibe sedem ku di nav civakê de mît çêbibin. Li gorî Bedran Hikmetî, “qedexekirin an jî cezadayîna têkilîyên ensestî, rê lê vedike ku ew xwe veşêrin û bi sembol û hêmayan di nava mîtan de bi cih bibin heta di radeyeke wilo de ku mît bi temamî li ser wê temayê ava bibin” (Hikmet, 2016, hr.).

Di mîtolojiya yewnanan de pêkhatina minasebeta cinsî ya kur û dayikê, ango çêbûna têkilîya ensestî, wisa dihat qebûlkirin ku mirov li ber hêzên xwedayî radibin û dijî qanûnên wan derdikevin. Ji lew re tê dîtîn ku di mîtan yewnanan de têkilîya ensestî, tabû û qedexeyên derbarê minasebeta kur û dayikê de gelek çîrokên mîtik hatine vegotin. Ev çîrokên mîtik berîya zayînê di sedsala pêncem de derbasî nivîsê dibin û vediguherin bi berhemên edebî yê şanoyî ku ji wan re trajedî tê gotin. Qedera mirovan û rûbirûbûna wan a bi hêzên xwedayî herçend mijarên sereke yê van şanoyan be jî, tê dîtîn ku di van şanoyan de civak tê hişyarkirin û desthilat tê rexnekirin. Berîya zayînê di sedsala çarem de berhemên trajîk ên bi vî hawî meşhûr dibin û belavê tevahiya erdnîgarîya yewnanê dibin. Yek ji pêşengên van berhemên edebî yê şanoyê jî Sofokles (Sophocles) e ku mîta Oîdîpusî ji aliyê wî ve hatiye nivîsîn (Aslan, 2020, r. 10-11). Sigmund Freud, li ser vê berhemê -ku navê Rex Oîdîpus e- nêrînên xwe rave dike (Çeliktaş, 2025, r. 125). Ew di berhema Sofoklesî de, ji bo Oîdîpusî, li hemberî dayîka xwe têkilîyeke seksuelî (grêka Oîdîpusî), li hemberî bavê xwe jî kerb û nefretek dibîne (Guntaş Aldatmaz, 2021, r.13).

Di xwendina rasterast a mîta Oîdîpusî de ewilîn Oîdîpus li hemberî qedera xwe wek kesekî bêçare dixuye û mirov wî wek qurbanekî qederê dibîne. Di çîrokê de ew ji pêkhatina hin rûdanan ditirse û ji bo ku ew tişt pêk neyên jî jê direve. Lê herçiqas jê bireve jî herî dawî, ew rûdan pêk tên. Rûdanên ku ew jê ditirse û direve “bavê xwe kuştin û bi dêya xwe re zewicîn” in. Herçiqas di rûxarê de ew jî van bûyeran bireve jî di dilê xwe de ango di kûrahîyê de pêkhatina wan dixwaze. Bi gotineke din ew bi pêkanîna van bûyeran kompleksa xwe pêk tîne. Di rexneya psikanalîtîk de mîtek wexta ku li gorî manifestoya xwe bi awayekî rasterast bê xwendin, wataya kûr û sembolîk a mîtê eşkere nabe. Ger bi vî çavî mirov mîta Oîdîpusî bixwîne wê bibêje ku ew mirovekî bextreş e, li hemberî qedera xwe stûxwar e. Bereksê wê ger bi çavekî psikanalîz çîrokê bixwîne û bala xwe bide sembol û wataya kûr a berhemê, wê bibêje ku ji ber ku wî arezûyên xwe yê veşartî tetmîn kirine, ew kesekî serketî ye (Segal, 2004, r. 125).

Freud, di kitêba xwe ya *Rüyaların Yorumu [Şiroveya Xewnan]* de, balê dikşîne ser vê yekê ku di dema zarokatîyê de arezûyên cinsî û tirsên serkûtîkirî zêdetir di xewnan de derdikevin holê. Arezûyên libîdînal ên ku biroj tene serkûtîkin, di dema razan an halusînasyonê de serbest dibin, piştî jî dibin xewn û fantazî (Çobanoğlu, 2019, r. 168). Bi vî awayî mît, di bin van şertan de rêya herî bibandor e ji bo tetmînkirina arezûyan. Di mîta Oîdîpusî de jî em rastî vê yekê tên. Ew di dilê xwe de dixwaze ku rûdana ku jê direve, pêk were. Ev yek bi xwendina rasterast bi dest nakeve; lê ji bo peydakirina wataya kûr divê hin nîşanên ku wataya rastîna a mîtê eşkere dikin, bên analîzkirin. Bi gotineke din wataya rastîna di kûrahîyê de ye, ji bo ku ew wata derkeve holê sembolên ku di wataya rûxarê de cih digirin bên dahûrandin. Ev sembolên han jî aliyê derhişê ve çêdibin û ji ber vê jî di wan de agahiyên giranbiha peyda dibin derbarê dinyaya hundirîn a ferdan de. Ji ber vê yekê Freud û psikanalîstên li ser şopa wî,

di xewn û mîtan de xwestine ku sembolan bibînin û van sembolan analîz û şîrove bikin. “Li gorî Freud, erka mîtê ji wataya wê derbas dibe: Mît bi navbeynkarîya çîrokekê, bêhn dide arezûyên Oîdîpal ku bi awayekî sembolîk pêk tên” (Segal, 2004, r. 126).

Hiş û derhiş wek bingeha xebatên Freud û şopgerên wî tên qebûlîkirin. Tevger, xwestek, arezû û ramanên mirovan li gorî hiş û derhişê tên meydanê ku îd, ego û superego di şewandina hest û ramanan de karîger in. Xwestek û arezûyên libîdînal li gorî rê û rêzika îdê bi şêkil dibin. Arezû û daxwazên serkûtkirî di bin emrê îdê de ne û her wext dixwazin derkevin asta hiş. Superego bi rêya serkûtkirîne pêşîya vê yekê digire. Îd û superego hertim di nav şerekî de ne. Îd dixwaze ji qeyd û benda superegoyê xelas bibe. Wek temsîla hiş ego jî şerê herduyan bi rê ve dibe. Xwestek û arezûyên serkûtkirî ancax bi rêya hin îmaj an sembolan dikarin derkevin asta hiş û di van îmaj û sembolan de jî gelek agahî kom dibin. Lewma kesê ku dixwaze bigihîje wataya rastîn a berhemekê divê watayên van îmaj û sembolan bizanibe, analîz û şîroveya xwe ya ji bo wataya kûr a berhemê li ser wan ava bike. Li gorî psîkanalîstan “di bin naveroka eşkere de fantaziya mastûrbasyonê, xesandin, rûxandina gewdeyê, hesûdîya penîs û ensest veşartî ne” (Dorson, 2017, r. 71). Bi kurtî hiş xwestek û arezûyên libîdînalên ku ji îdê tên, vedîşêre û sansur dike; lê ew tiştên ku hatine serkûtkirin hem di xewnan de hem jî di mîtan de bi rêya sembolan derfeta derketinê dibînin.

3. Hêmanên Mîtkî di Romana Hesar û Kûçikên Bavê Min de

Di bin vê sernavê de em ê bi rexneya psîkanalîzê romana *Hesar û Kûçikên Bavê Min* analîz bikin da ku hêmanên wê yên mîtkî derkevin holê. Di destpêkê de em ê kurtiya romanê bidin, piştî romanê ji aliyê hêmanên mîtkî ve şîrove bikin û herî dawî jî hêman û motîfên mîtkî ên ku di romanê de cih digirin, nîşan bidin.

3.1. Kurtiya Romanê

Ji navê romanê jî diyar e ku di romanê de behsa hesarekê tê kirin ku di wê hesarê de malbateke mezin dijî. Hesar ji aliyê bavê malê ve tê birêvebirin ku bav ji gelek aliyên ve desthilatdarekî zilmkar e. Gelek jin û zarokên wî bavî hene ku di bin emrê wî de karên hesarê bi cih tînin. Bav li hemberî jin û zarokên xwe kesekî bêrehm e, gelek tade û neheqî li wan dike. Çi jin çi mîr qîmeta mirovên vê hesarê nîne, bav li hemberî jin û zarokên xwe kesekî dilkevir e. Ji xeynî endamên malbatê heqê tu kesên biyanî nîne ku têkevin nav vê hesarê, bi taybetî destûra tîketîna xort û ciwanên berzewac nîne. Îş û karên vê hesarê ji aliyê kur, keç û jinên bav ve tên kirin. Di nav vê hesarê de ji aliyê bav ve çi kûvî çi kedî gelek heywanên xwedîkirin. Kûçik, hesp, çivîk, kevok, kîvroşk, pîsik, bilbil, hêstir, sivorî û hwd. heywanên sereke yên hesarê ne. Di vê hesarê de ji xeynî hespên erebî yên bav, hemû heywanên din ji aliyê bav ve tên xesandin. Heywanên li hesarê di axûr, tewle, kolik, koxik, pîn, hêlîn û qefesan de tên xwedîkirin. Di vê hesarê de qedr û qîmeta heywanan ji ya mirovan zêdetir e. Ji aliyê bav ve gelek caran pesna heywanan tê dayîn, bi taybetî kûçikên wî ji aliyê wefadarîyê ve di pêş jin û zarokên wî de ne.

Roman li ser rûdana kuştina bav ava dibe. Jin û zarokên ku di nav hesarê de dijîn, ji ber zilm û zordarîya bav nikarin jiyanê azad bijîn, hewes û xwestekên xwe pêk bînin. Ji bo ku dawî li vê bindestîyê binîn, çavên wan li ser nixurîyê malê ne. Nixurîyê malê, wek rizgarkerekî tê dîtin ku pir caran ji aliyê bira, xwişk û dayikên xwe ve tê handan ji bo kuştina bav. Di vê meseleyê de kur ango nixurîyê malê pir caran xwe kêr, çeçelok, xesandî, bîxîret û bêhêz dibîne. Tirs û xofa bav li ser kurê malê ewqas zêde ye ku di kêlîya plankirina kuştina bav ya hişê xwe de bav wek reşba nêzikê wî dibe. Kur ji bo ku xwe hînî kuştinê bike, di dewsa bavê xwe de bûkîkekê datîne.

Jina dawî ya bav ku navê wê Rabî ye, di kuştina bav de hêzê dide nixurîyê malê û wî teşwîqî

kuştina bav dike. Rabî jina biçûk a bav e ku ji jinên wî yê din “ciwantir, şengtir û ezîztir” e. Rabî hîna bûka yek mehî ye, kuştina bav li ber kurî xweş dike. Ew mêbûna xwe derdixe pêş û jê daxwaza kuştina bav dike. Li gorî kurê malê ger ew jina biçûk nebûya, wî yê nikaribûya bavê xwe bikuşt. Rabî bi gotinên xwe yê tûj dixwaze berê nixurîyê malê bide kuştina bav.

Kurê malê heta ku bavê xwe dike, hertim di nav tirs û gumanê de dimîne. Herçend wî ev raz di dilê xwe de veşartibe jî ji wî wetrê herkesê li hesarê hay ji nîyeta wî ya kuştinê heye. Ev dudilî gelek caran bêhna wî teng dike, ji tirsê eşkerebûna raza kuştinê lerz bi canê wî dikeve, derman li çokên wî namîne.

Di şeveke reştarî de nixurîyê malê bi hemû wêrekîya xwe derbasî odeya bav dibe û bêyî ku haya bav jê hebe, di kêlîya pevşabûna bav û jina wî ya biçûk Rabîyê de bi sê derbên xencerê bavê xwe dikûje. Bi kûştina bav re li hesarê şahî çêdibin, fena “çarxaneyek û karnavalekê” herkes bi awayekî dilxweş li benda rojên xweş û geş ên hesarê dimîne. Ji bo endamên malbatê mirina bav di eslê xwe de têkçûna bindestîyê, hatina azadîyê ye.

Piştî mirina bav, ew azadîya ku li bendê bûn, pêk nayê; bereksê vê rewşê pergala hesarê xera dibe. Hemû kilfîlên derîyan tîr vekirin, xwişk û birayên zindanî ji zindanan tîr derxistin, hemû derîyên axûr, tewle, kolik, pîne, qefes û hwd. ên heywanan tîr vekirin; lê belê mirov û heywanên li hesarê nikarin ji bindestîyê rizgar bibin. Hemû keda nixurîyê malê ya ji bo azadîyê pûç û vala dibe. Herî dawî nixurîyê malê ji aqlê xwe yê şîrîn dibe, aqlê wî di navbera rastî û xeyalan de diçe û tê. Di nav kumbetekê de bi awayekî mîna mirîyan, kuştina bavê xwe pirsîyar dike.

3.2. Nirxandina Romana Hesar û Kûçikên Bavê Min ji Alîyê Hêmanên Mîtk û Rêbaza Psîkanalîz ve

Di romana Şêrzad Hesen de yekem tiştê ku balê dikşîne ser xwe arezûyên libîdînal in. Çi mêr çi jin hemû kesên di romanê de derbas dibin, bi awayekî rastî serkûtkirina arezûyên xwe yê libîdînal hatine û arezûyên wan ên serkûtkirî jî gelek caran bi rêya xewn, xeyal û fanteziyan der bûne. Di serkûtkirina arezûyan de rola sereke ya bav e, ku di bin otorîteya wî ya sitemkar de şênîya hesarê dipelçiqe. Xesandin, şehwet, cinsîti û kuştina bav, daxwaza pevşabûnê û sembolên psikolojîk ên wek heyv, bîr, gor û hwd. wisa dikin ku di warê nirxandinê de berê me biçe rêbaza psîkanalîzê ku ji alîyê Freudî ve bingeha wê hatibû danîn.

Ev roman ji gelek alîyan ve dişibe mîta Oîdîpusî, nixurîyê malê ango lehengê romanê mîna lehengê çîroka mîtk bavê xwe dike û dixwaze bi dê/dêmarîya xwe re şa bibe. Herwiha hêmanên wek bavekî otorîter, pîr jin û yê ku xwe ji alîyê cinsîti ve tetmîn dike; zarokên ku arezûyên wan hatine serkûtkirin û bi rêya xewn û xeyalan xwe tetmîn dikin; arezûya cinsî ya aresteyî dêmarîyê bûye; têkilîya ensest; qetla bav; piştî qetlê kaosa li hesarê û herî dawî xerabûna bitûnîya derûnîya nixurîyê malê derfet dide ku ev roman li gorî Girêka Oîdîpusî bê vekolan. Li gorî Freudî di dema zarokatîyê de kur bi eleqeyeke erotîk nêzîkê dayîka xwe dibe û ji ber vê jî rik ji bavê xwe digire. Ev yek vekêşan û pozberîyekê derdixe holê. Gelek caran ew rewşa oîdîpal tê serkûtkirin û ber bi derhişê tê dehfdan. Ew arezûyên libîdînal ku di îdê de cih digirin û dixwazin derkevin asta hiş, ji alîyê superegoyê ve tîr pêpeskirin. Di vê romanê de kesê ku superegoyê temsîl dike bav e. Ew ewqas zêde zordestî li zarokên xwe dike ku di diyaloga wî û jineke wî de ev yek bi rehetî tê dîtin. Jinek acizîya xwe tîr zimên li ser meseleya jinanîyê. Ew xwe wek Silêman û Îbrahîm Pêxember dibîne û li ser fazîleta jinanîyê wan bi fehmkorîyê sûcdar dike. Li gorî wî her zilam pêxemberê hesara xwe ye, ji ber vê jî jinanîna wî tiştêkî bi xêr e. Lê wexta mesele tê ser zewaca qeyrekeç û kurên wî, xwe aciz dike û bi gefxwarîyê dengê wan dibire:

“Kî ji vê hesarê hez neke bila here. Ez baş dizanim li derveyî vê derê wê çi were serê we. Ger hîkmeta min nebûya, ew hesar wê wêran bûya. Di her kerpîçekî de şopa tiliyên min heye. Min bi vê

pişta xwe kêran û mertek anîne. Ez ewqas westîyam ku heqê min heye ku kî zimanê xwe derxe û dirêj bike, zimanê wê ji binî ve bibirim. Xeyalên xirab nebînin. Kes ji we li derveyî vê hesarê û dûrî çavên min najî” (r. 23).

Di vê paragrafê de çend diyarde bala mirov dikişîne. Di destpêkê de bav ji bo ku hesar ava kiriye xwe desthilatê yekane yê wê derê dibîne. Ji ber vê jî ketin an jêderketina wê derê bi tenê di destê wî de ye. Piştî bi rêya gefxwarinê pêşî liberabûnan digire. Ewqas neheqî li wan dike ku qedexeyên wî digihîjin heta xeyalên wan. Zordestiya bav tenê ne ji bo jinên wî ye, di heman demê de ji bo kur û keçên wî ye jî:

“...Ew kurê ku bi ya min neke, hêjayê serjêkirin û xesandinê ye. Yên ku ji vê hesarê reviyane û çûne bajaran, qaşo îro ne sibê wê bi çek û pereyekî zêde vegezin û cihê min bigirin. Ya wan xewneke tewş e. Ez ne zilamekî wisa me ku ji zarokên xwe bitirsim. Keçên ku xwestin ez stûxwar bim û li pey hinan ketin min ew kirin xwarina baz û qertelan. Destê min ewqas dirêj e, digihîje binê dinyayê. Beriya ku kur an jî keçeke min tiştên wisa xirab xeyal bike, ez pê dihesim. Hûn di dilê xwe de bipeyvîn jî ez dibihîsim” (r. 24).

Tê dîtin ku bav bi hemû heyîna xwe dixwaze bibe desthilatê tek ê hesarê. Ji ber wê jî zarokên xwe bi xesandin, parçekirin û kuştinê tehdît dike. Di vê derê de bala mirov diçe ser xwepîrozdîtina bav. Bav hem xwe dişibîne pêxemberan hem jî îdîa dike ku bi xeybê dizane. Bi gotineke din bav xwe mîna xwedawendên mîtan mezin, zana, bihêz û pîroz dibîne. Ji ber ku ew xwe kesekî pîroz dibîne, ji keç û kurên xwe xizmeteke baş dixwaze.

Ji ber ku ji yekê zêdetir jinên wî hene û ji aliyê cinsîtiyê ve xwe bi rehetî tetmîn dike mirov dikare wî wek kesekî xwedan arezûyên bêsînor bibîne. Bereksê vê yekê bi serkûtkirina arezûyên zarokên xwe jî dibe kesekî qedexekerekî mitleq. Bi gotineke din ew wek bav û kalê primitîf hin qedexê û tabûyan datîne ji bo zarokên xwe. Ji ber vê yekê jî bav ji aliyekî ve dibe figurekî kerb û xezebê, ji aliyê din ve mînakê desthilatîyê ya bav û kalan. Ji ber vê jî bav di çavên zarokên xwe de hem dijmînekî ye hem jî dibe kesekî xwezîpêanîn. Ev binyada duyatî wisa dike ku nixurîyê malê ango lehengê romanê di navbera çûnûhatinê de bimîne û berberîya di hindurê wî de rewşa wî ya derûnî xirabtir bike.

Di romanê de mijareke giring jî tekilîyên ensestê ne. Di bin zilm û zordariya bav de qeyrekeçên hesarê hemû arezûyên xwe yê serkûtkirî yan di xewnên xwe de yan jî di xeyalên xwe de pêk tînin. Piştî demekê ew xewn û xeyal ji derhişê derdikevin asta hiş û di jiyana rastî de derfeta pêkhatinê dibînin. Gelek caran haya nixurîyê malê ji vê rewşa sosret dibe û ji xwe fedî dike. Di eslê xwe de derûniya wî dibe du parçe, aliyekî wî zewq jê digire, aliyê din di nav kerb û qehran de dimîne. Ew binyada duyatî li vê derê jî li ber çavan dikeve. Zewq û fedî di yek qalibê de bi cih dibe. Di paragrafêkê romanê de leheng bi rêya monologa hindurînê vê rewşê wiha vedibêje:

“Xwedêyo, hawar e! Ma di tarîtiyê de çi çênabe? Helkehelka wan a fetisokî ya şerm û tirsê ji bin lihêfa wan dihat ber guhê min. Min teziyeke zewq û tirsê dibihîst ku ji bin lihêfa wan dihat. Teziyeke zewq û qehran wek morîyan di nav demarên min de digeriya. Min heta ku xwîn jê were bi neynûkan çermê herdu ranên xwe naperûçk kirin. Tif li wî birayê mezin ê bê xîret û nixurîyê stûxwar û xesandî! Her şev, yek ji wan cotan dibû zilam û ya din jî dibû jin. Dema ku dibû roj, me şerm dikir ku em li hev binihêrin. Min qet bawer nedikir ew keçên şermîn, biwêrin ku xewnên heram bibînin!” (r. 29)

Ev arezû û tevgerên libîdînal ên ku di navbera qeyrekeçên hesarê de pêk tên, derketina nihişkên cinsî ne ji derhişê ku bi awayekî serkûtkirî li wê derê veşartî ne. Arezûya qedexebûyî, wexta ku bi awayekî rastîn derbasî jiyana dibe, hevsengîya derûniya mirov jî xera dibe. Ev yek jî dibe sedema hesta xwesûcdardîtîne. Lewma nixurîyê malê xwe bêxîretî, stûxwarî û xesandinê sûcdar dike. Di romanê de minasebeta cinsî ya kur û dayikê herçend pêk neyê jî di navbera kur û dêmarîyê de nîşaneyên vê yekê

tên dîtîn. Jina biçûk Rabî li ser bîrê ye, bi qestî xwe bi ser bîrê de xwar dike da ku pêşîrên wê bala nixurîyê malê bikişîne. Herçend haya nixurîyê malê ji nîyeta wê hebe jî di dewsa şermê de dilê xwe xweş dike. Wexta ku pêşîrbenda dêmarîya wê didire, “Coka teng a nava herdu memikên wê” lehengî gêj dike û ji ber jixweveçûnê hindik dimîne ku bikeve nava bîrê (r. 34). Herwiha di dereke din de jî di dewsa bavê xwe de dixwaze lêvên wê maç bike (r. 43). Ev yek nîşana daxwaz û arezûya cinsî ya li hemberî dayikê ye ku di dewsa dê de dêmarî heye. Herçend ji alîyê civakî ve qebûlkirina vê arezûyê ji ya dayikê hêsantir be jî, di dawîya dawîn de binpêkirina tabûyekê heye. Bi gotineke din di derhişê de tabû û qedexeya enestê dixwaze derkeve asta hişê.

Xala nîskokê ya romanê kuştina bav e ku bav bi sê derbên xencerê ji alîyê kurê xwe yê mezin ve tê kuştin. Ji alîyê psikanalîzê ve mirov dikare vê yekê bîne zimên ku ev rûdan pêkhatina arezûyên oîdîpal e. Li hemberî bav hesûdî, kerb û kîna ku di derhişê de pêpesbûyî, bi rêya kuştinê bi awayekî tundûtûj tê asta hiş. Herçiqas kuştina bav wek tetmînkirina arezûya serkûtkirî ya derhişê were qebûlkirin jî di heman demê de daxwaza manendîbûna bav jî di vê rûdanê de xuya dibe. Nixurîyê malê hem dixwaze bavê xwe bikuje hem jî dixwaze kesekî mîna wî be. Nixurîyê malê bi kuştina wî di dilê xwe de dixwaze dewsa wî bigire. Bi kuştina bav azadîya ku li hêvî bûn, pêk nayê; bereksê wê di romanê de piştî vê bûyerê du diyarde derdikevin meydanê: Kaosa li hesarê û xwesûcdardîtina kur.

Piştî qetla bav atmosfera romanê diguhere. Leheng hêdî hêdî ji alîyê derûnîyê ve xerabtir dibe û girêdanîyên wî yên bi rastîyê re lewaz dibin. Revîna dêmarîyê bi hezkirîyê xwe re û ya xwişk û birayên wî ji bo şehwetê pêvajoya xerabûna derûnîya leheng leztir dike. Herçiqas di rûxarê de hesar hilweşiyayî xuya bike jî di kûrahîyê de bitûnîya derûnîya leheng hildiweşe. Ji ber vê jî nixurîyê malê di navbera rizgarker û kujerî de diçe û tê. Di gelek cihên romanê de ev duyafî eşkere dibe.

3.1.1. Hêman û Motîfên Mîtîk ên di Romanê de

Wek ku li jorê jî hatibû diyarkirin ku hin hêman û motîfên di romanê de derbas dibin, ji bo nîşandana hiş û jiyana mîtîk muhîm in. Ji van hêman û motîfan ên ku derbarê cismên esmanî de ne, cihekî muhîm digirin. Ji xeynî cismên esmanî bîr, gor, agir, berbêjî û gelek hêman û motîfên mîtîk ên din di romanê de cih digirin ku em ê li jêrê behsa wan bikin.

3.1.1.1. Heyv û Roj

Di romanê de heyv wek mîrekî tê şayesandin. Heyv bi hemû xweşikaya xwe bala keçên hesarê dikişîne. Xwişka nixurîyê malê Zîba, dibîne ku memikên wê derketine, di heyva çardeşevî de derdikeve ser banî û memikên xwe dide ber ronahîya heyvê û li ber ciwanîya heyvê sermest dibe (r. 27). Bav hez ji heyvê nake û wek kesekî mîr li hemberî wî be, tif lê dike. Li gorî bav, heyv wek nîrekî çavhîz e (r. 28). Heyv di gelek mîten dinyayê de bi jin û berhemdarîyê re tê têkildar in. Gelek caran çavkanîya hemû berhemdarîyan heyv tê qebûlkirin ku halê hayzeya jinan (regl) ji alîyê wê ve tê rêvebirin. Ew wek “efendîyê jinan” tê kesandin. Li cem gelek neteweyên dinyayê heyv wek mîrekî tê qebûlkirin ku bi jinan re têkilîya cinsî datîne (Eliade, 2005, r. 200).

Mirov xwe gelek caran di neynika heyvê de dibîne. Çawa ku heyv derdikeve, bi demê re şeklê wê diguhere û herî dawî jî wenda dibe, jiyana mirov jî pêk tê ji zayîn, mezinbûn û mirinê. Mirov hêvî dike ku mîna heyvê ji nû ve dest bi jiyanê bike, ji ber vê jî ew di nêrîna wan de dibe sembola zêdebûn û zayîna jinûve (Eliade, 2005, r. 191).

Di romanê de wek motîfeke mîtîk roj jî derbas dibe û bi mezinbûn û heşmeta xwe, hurmeta bav digire. Ev yek di romanê de wisa derbas dibe:

“...Bavo gelek ji rojê hez dikir. Roj dişewitand, dibirjand û dikeland. Tu kesî nedikarî ji dûr ve jî

be li rojê binihêre. Rojê ser ditewand û çav dida girtin” (r. 28).

Li gorî M. Eliadeyî li cihên ku di wir de qralî, lehengî û împaratorî hebin, roj bi mezinbûn/ûlûhiyetê derdikeve pêş (Eliade, 2005, r. 153). Hemû heyîneyên berz bi rojê re têkildar in. Çimku ew mîna heyvê sê şevan wenda nabe û sibetirê ji nû ve vedigere. Roj bi vê watayê hem têkildar e bi desthilatê re hem jî bi berhemdarîyê re. Ji ber vê jî mezinahî hertim li rojê tê kirin. Li jorê jî hatibû nîşandan ku bav xwe yekane desthilat dihesibîne û xwe wek xwedawendekî pîroz û zana dibîne. Li vê derê mirov dikare vê yekê bîne zimên ku bav di heman demê de dixwaze wek rojê mezin û berz be.

3.1.1.2. Bîr û Gor

Di romanê de bîr û gor gelek caran derbas dibin ku di rexneya psikanalizê de herdu jî wek sembola vegera li malzarokê tên qebûl û şirovekirin. Hezkiyê Mîna xwişka leheng di kolandina bîrê de ji aliyê bav ve tê xeniqandin (r. 42). Bav wexta ku şewqa heyvê di bîrê de nabîne, dilê xwe xweş dike wek ku heyv li wir xeniqîbe (r.32). Bi kurtî bîr li dijî zayînê, dibe sembola xeniqandin û kuştinê. Herwiha gelek caran gor jî wek sembolekê di romanê de cih digire. Piştî mirina bav nixurîyê malê di nav xwesûcdardîtin û poşmanîyê de diçe ser gora bavê xwe û dixwaze ji cihê birîna wî angosê memikê wî yê çepê ava heyatê -ku jê ve pîroz dixuye- vexwe. Bi gotineke din dixwaze têkeve nav gorê angosê malzaroka dayika xwe. Di vê derê de di dewsa dayikê de bav ava heyatê dide zarokê xwe (r. 85).

3.1.1.3. Hêman û Motîfên Din

Di romanê de hin bîr û bawerî jî dikarin wek nîşaneyên hiş û jiyana mîtik werin hesibandin. Bîr û bawerîya sereke derbarê ruhê mirovan de ye. Sedema vekirîmana çiraya serşoyê ew e ku ruhê zilamekî qenc li wir e. Ew kesekî ji eshabîyan e û di şerê kurdên kafîr de şehîd bûye. Ev ruh biroj radize, bişev jî digere. Ev bawerî ewqas xurt e ku di navbera şênîya hesarê de bawerî pê tînin ku ger ev ruh bê nerehetkirin dê li wan bide. Heta ku du xwişkên lehengî rastî lêdana vî ruhê qenc hatine (r. 35). Li gorî bîr û bawerîyên wan di goristanê de jî gorên eshabe hene. Piştî em ji diyaloga notirvan û nixurîyê hîn dibin ku di eslê xwe de tu gora eshabeyî di goristanê de nîne. Ew gora ku wek ya eshabe hatiye zanîn û bi mermer xemilîyê di rastîyê de gora hespê bavê notirvan e. Li gorî notirvan li goristanê ne eshabe heye ne jî şehîden şerî. Piştî çêkirina gora hespê bavê notirvan jin û mîr tevde tên li ser gorê nîza û dia dikin. Bi gotineke din derewek piştî demekê dibe rastî (r. 75-76). Li vê derê em rastî vê yekê tên ku rûdan an diyardeyeke jirêzê bi saya hişê mîtik ber bi pîrozbûn û rastîbûnê diçe. Ev yek jî delîla aktîfbûna hişê mîtik ê kesên romanê ye.

Ji xeynî van yekan berbêjîya jina qereçî ya ku ji bav re digot “Tu yê di paşîla jineke xwe de bimirî. Di paşîla wê jina xwe de ku li ber dilê te jî hemûyan ezîztir e” (r. 36.) berê me dide çîrokên mîtik. Di çîrokên mîtik de gelek caran berbêjîyên bi vî awayî bi rêya xewn an kehanetê çêdibin. Di mîta Oîdîpusî de dêya leheng di xewneke xwe de rûdanên ku dê pêk werin, pêşbînî kiribû. Di vê romanê de jî vê peywirê jina qereçî pêk tîne û kehaneta wê pêk tê.

Di romanê de bikaranîna hin peyvan jî ji bo nîşandana jiyana mîtik muhîm in. Peyvên wek perî, dêw, erjeng, spêle, reşe, ehrîmen, doje, reşeba, leylan û hwd. wisa dikin ku xwîner xwe di nava atmosfereke mîtik de his bikin.

Encam

Di encama vê xebatê de hate dîtin ku mît ne tenê çîrokên kevnare yên demên berê ne ku bi armanca xweşderbaskirina demê tên vegotin. Ew wek zimanekî taybet e ku di derhişa ferdan de kar dike û bîra hevpar a gelekî jî di wê de veşartî ye. Mirov dikare vê yekê bîne zimên ku di serdema modern de çîrokên mîtik ên wek mîta Oîdîpusî bi hezar salan şûnde bi rêya îmaj, sembol û metaforan di nav

romanên wek *Hesar û Kûçikên Bavê Min* de di wataya kûr a berhemê de hebûna xwe diparêzin. Di dawîya nîrxandinê de hate dîtin ku romana *Hesar û Kûçikên Bavê Min* ji aliyê binyada mîtîk ve feyza xwe ji mîta Oîdîpusî wergirtiye. Bi gotineke din mîteke kevin bi kirasekî modern di edebiyata kurdî de ji nû ve hatiye nivîsîn. Nivîskar digel ku tema û mijarên sereke yên mîta Oîdîpusî bi kar anîye, di heman demê de ji bo ku atmosfera mîtîk bi xwîneran bide hesandin sûd ji hêmanên mîtîk jî wergirtine ku ev yek ji bo îdraq û fêmkirina hişê mîtîk diyardeyeke giring e.

Di romanê de bav hem otorîteya civakê temsîl dike hem jî wek sembola serkûtkirinê ye. Nixurîyê malê ango leheng, bi arezûya xwe ya libîdînal ku aresteyî dêmarîyê bûye û bi kuştina bav di navenda romanê de cih digire. Di romanê de kuştina bav di wataya rûxarê de wek liberabûn û serhildanekê dixuye; lê mirov dikare vê şiroveyê bike ku di wataya kûr a berhemê de kuştina bav di heman demê de hilweşîna pergala mîtîk e. Bi gotineke din arezûyên serkûtkirî yên ku di derhişê de veşartî ne, ji aliyê superegoyê ve hewqas tîr pêşeskirin ku wek teqîneke jinişkave ya derhişê her tiştî hildiweşîne. Li vir teqîna derhişê qetla bav e. Yanê qetla bav hem teqîna derhişê ye hem jî hilweşîna pergala mîtîk e.

Di kêlîya xwendina romanê de qetla bav, rizgarîya gelê hesarê pêk naîne, pergala hesarê xera dibe. Ev yek jî bi me nîşan dide ku ev rûdan ji bo leheng destpêka xelasîyê nîne, bereksê wê destpêka parçebûna derûnîya wî ye. Çimku piştî kuştina bav, derûnîya leheng du parçe dibe û nizane ka ew kesekî qehreman an kujer e. Leheng di navbera rastî û xeyalan de xwe wenda dike û ji ber hesta xwesûcdardîtîyê rewşa wî ya derûnî her ku diçe xerabtir dibe.

Piştina kuştina bav li hesarê kaosek pêk tê û pergala hesarê ji binî ve hildiweşe. Ev kaos ne tenê xerabûna pergala malbatê nîşan dide, di heman demê de hilweşîna bitûnîya kesayetîyê jî nîşan dide. Bi vê peywendê mirov dikare bibêje ku roman di asta sembolîk de kefareta hin rewşên derûnî nîşanî me dide. Ferdên ku li gorî derhişa xwe tevdiagerin, di navbera arezû û qanûnan de asê dimînin û bitûnîya xwe ya kesayetîyê wenda dikin.

Roman ji aliyê hebûna hêman û motifên mîtîk ve gelek dewlemend e û ev yek jî ji bo hesandina hiş û jiyana mîtîk gelek giring e. Di romanê de hate diyarkirin ku cismên esmanî yên wek heyv û roj, bîr, gor, goristan, ruh, berbêjî, agir, bîr û bawerîya şênîya hesarê wek hêmanên sereke yên mîtîk di berhemê de cih digirin. Ji xeynî wan bikaranîna nav û wesfên wek perî, dêw, erjeng, spêle, reşe, ehrîmen, dojah, reşeba, leylan û hwd. jî atmosfera jiyana mîtîk xurtir dikin.

References/Çavkanî

- Aslan M. (2020). Analîz û berawirdkirina varyanta kurdî ya çîroka odîpusî li gel çend varyantên din. *Folklor û Ziman*, 1(1), 9-34.
- Batuk, C. (2009). Mit, tarih ve gerçeklik sorunu üzerine notlar. *Milel ve Nihal*, 6(1), 27-53.
- Campbell, J. (2021). *Kahramanın sonsuz yolculuğu* (9. b.). (Wer. S. Gürses). İthaki.
- Çelikaş, S. (2025). Arîşeya navbera bav û kur di vegêrana gelêrî de: analîzek li ser çîroka hesên, şêrhêsên û gulperîyê. *Nûbihar Akademi* 23, 123-138.
- Çobanoğlu, Ö. (2019). *Halkbilimi kuramları ve araştırma yöntemleri tarihine giriş*. (Çapa 10.). Akçağ Yayınları.
- Dorson, R. M. (2017). *Folklor û teorîyên folklorê yê îroyîn*. (Wer. N. Keskin). Avesta.
- Eliade, M. (2001). *Mitlerin özellikleri* (2. b.). (Wer. S. Fırat). Om Yayınevi.
- Eliade, M. (2005). *Dinler tarihi inançlar ve ibadetlerin morfolojisi*. (Wer. M. Ünal). Serhat Kitabevi.
- Erhat, A. (2021). *Mitoloji sözlüğü*. Remzi Kitabevi.
- Goody, J. (2017). *Mit, ritüel ve söz*. (Wer. D. Sezgi). Küre Yayınları.
- Guntaş Aldatmaz, N. (2021). Varyantê qiral oîdîpusî yê kirmanckî û sînorê nasnameyê kulturî. *Folklor û Ziman*. 2(1), 09-28.
- Hesên, Ş. (2020). *Hesar û kûçikên bavê min*. (Wer. Memê Mala Hinê & I. S. Mahmood). Weşanên Dara.
- Hikmet, B. (2016). *Teorîyên folklorê*. Weşanxaneyê Lis.
- Honko, L. (2014). Miti tanımlama problemi. dnd. (Ed.) M. Ö. Oğuz, & S. G. Teke, *Halk biliminde kuramlar ve yaklaşımlar 2*. (Wer. N. Temür). Geleneksel Yayınları. rr. 145-153
- Kirk, G. (2014). Mitleri tanımlamak üzerine. dnd. (Ed.) M. Ö. Oğuz, & S. G. Teke. *Halk biliminde kuramlar ve yaklaşımlar 2*. (Wer. K. Türkan, s.). Geleneksel Yayınları. rr. 154-160
- Küçükcoşkun, Y. (2016). *Türk romanında mitik görünüm (1980-2005)*. *Yayınlanmamış Doktora Tezi, Pamukkale Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü*.
- S. Cohen, P. (2014). Mit kuramları dnd. (Ed.) M. Ö. Oğuz, & S. G. Teke. *Halk biliminde kuramlar ve yaklaşımlar 2*. (Wer. E. Ö. Özünel,). Geleneksel Yayınları. rr.161-172
- Segal, R. A. (2004). *Mit*. (Wer. N. Örgü). Dost Yayınları.
- Subaşı, K. (2022). Kesayetên mîtolojîk û rengvedanên wan di edebiyata gelêrî ya kurdî de. dnd. (Ed.). S. Vali, & K. Subaşı. *Mîtos û edebiyat mîtosên kurdo-îranî di edebiyata kurdî de*. Nûbihar. rr. 83-164.
- Vali, S. (2022). Mîtos, mîtolojî û edebiyat. dnd. (Ed.). S. Vali, & K. Subaşı. *Mîtos û edebiyat mîtosên kurdo-îranî di edebiyata kurdî de*. Nûbihar. rr. 11-48

EXTENDED ABSTRACT

Myths constitute some of the most ancient and enduring forms of human narrative, embedded deeply within what Carl Gustav Jung famously identified as the collective unconscious. Far from being confined to the remote past, myths have consistently resurfaced across cultures and historical epochs, finding new life in literature, religion, and psychology. Their archetypal structures make them remarkably adaptable, allowing them to appear in diverse literary genres ranging from epic poetry and folk legends to modern novels and short stories. This universality and resilience suggest that myth should not be understood merely as a relic of antiquity, but rather as a living, evolving discourse that continues to shape human understanding of the world and of the self. In light of this perspective, the present study focuses on the Kurdish novel *Hesar û Kûçikên Bavê Min* and aims to demonstrate how mythic elements—particularly those related to the Oedipus narrative—are woven into its thematic and structural fabric.

The use of myth in literature is never a superficial embellishment or decorative motif. Rather, it functions as a symbolic language through which fundamental human experiences—fear, desire, rivalry, power, and conflict—can be represented and interrogated. Authors who employ mythological references are not simply repeating cultural stories for the sake of tradition, but are engaging with timeless patterns of human thought and emotion. In this sense, myths become both mirrors and mediators: mirrors because they reflect back to us our recurring existential dilemmas, and mediators because they provide a narrative framework through which these dilemmas can be understood and, at times, transcended. By embedding myth in their work, writers situate individual human struggles within a universal continuum, thereby elevating personal stories to the level of collective meaning.

Hesar û Kûçikên Bavê Min offers an exemplary case study of this phenomenon. Within the novel, certain events and character relationships strongly echo the classical Oedipus myth. The Oedipal narrative—originating in ancient Greek tragedy but subsequently reinterpreted by psychoanalysis—centers on themes of libidinal desire, incestuous attachment, patricide, and the destructive dynamics of authority and power. These motifs are not limited to the cultural context of Greece; instead, they resonate universally because they symbolize psychological conflicts intrinsic to human development. When these motifs emerge in the Kurdish literary context, as they do in *Hesar û Kûçikên Bavê Min*, they invite readers to recognize the shared archetypal foundations that connect seemingly disparate cultural traditions.

Freud's psychoanalytic framework provides a particularly productive lens through which to interpret such mythic elements. In his theory of the Oedipus complex, Freud argued that unconscious desires and repressed emotions structure not only individual psychology but also the cultural narratives societies construct. By applying the psychoanalytic method to *Hesar û Kûçikên Bavê Min*, one can uncover layers of meaning that extend beyond the literal events of the plot. For instance, acts of violence, expressions of desire, and struggles for dominance within the novel can be reinterpreted as manifestations of deeper unconscious tensions. This does not reduce the text to a psychological case study; rather, it highlights the interplay between literary creativity and universal psychological dynamics.

The methodological approach of this article is therefore threefold. First, it establishes a working definition of myth, emphasizing both its historical origins and its ongoing relevance in modern cultural production. This involves distinguishing between myth as a traditional story passed down through generations and myth as an archetypal structure that continually reappears in new guises. Second, it explores the relationship between myth and psychology, with particular attention to the contributions of Freud and, by implication, Jung. While Freud's psychoanalytic model is central to the analysis, Jung's notion of archetypes and the collective unconscious provides an important conceptual backdrop,

reminding us that myths persist because they articulate psychic realities shared across humanity. Third, the study applies these theoretical insights to the novel itself, examining how specific narrative elements resonate with, or diverge from, the Oedipal paradigm.

In terms of content, the novel addresses themes of physical and psychological violence, forbidden desire, familial transgression, and the perilous dynamics of authority. These are not incidental plot devices but rather central mechanisms through which the narrative unfolds. Such themes directly parallel the core concerns of the Oedipus myth, thereby enabling a comparative reading that illuminates both texts. Moreover, the presence of these motifs in a Kurdish literary work underscores the transnational and transcultural nature of myth. Just as Greek tragedy once articulated psychological and social conflicts in a particular historical moment, *Hesar û Kûçikên Bavê Min* rearticulates them in the context of Kurdish experience, thereby affirming the universality of mythic structures while also adapting them to local realities.

The article further argues that myths provide a unique means of negotiating the tension between individual subjectivity and collective identity. On the one hand, they dramatize intensely personal emotions—desire, jealousy, fear, rage. On the other, they link these emotions to broader cultural narratives, thereby offering individuals a sense of continuity with humanity as a whole. The psychoanalytic interpretation of *Hesar û Kûçikên Bavê Min* reveals how the novel uses myth not only to depict individual characters' struggles but also to comment on social structures of authority, violence, and repression. In this way, myth functions as both a psychological and a sociopolitical tool.

The significance of this research lies in its demonstration of how a Kurdish novel engages with myth in ways that transcend cultural and temporal boundaries. It reveals that myths are not static relics of a distant past but dynamic frameworks that continue to inform literature and thought. By employing Freud's psychoanalysis as a method of interpretation, the study highlights the continuity between ancient narratives and modern literary expression. More broadly, it illustrates how myth can serve as a bridge between psychology, literature, and cultural studies, thereby underscoring its interdisciplinary relevance.

In conclusion, this article seeks to enrich our understanding of both myth and literature by situating *Hesar û Kûçikên Bavê Min* within the long tradition of myth-infused narrative art. By tracing the parallels between the Oedipus myth and the novel, it demonstrates that myth remains a vital resource for contemporary authors. Moreover, by applying psychoanalytic theory, it uncovers the psychological depth of the narrative, revealing how literature can function as a medium for exploring unconscious desires, conflicts, and fears. Ultimately, the study suggests that myths endure precisely because they speak to what is most fundamental in human experience—our struggles with identity, desire, authority, and mortality. Far from being obsolete, they continue to shape our stories, our theories, and our understanding of ourselves.

Kürtçeden Arapçaya Geçtiği Düşünülen Bazı Kelimeler ve Tahlilleri*

Hin Peyvên Bingeh Kurdî yên ku Derbasî Erebî Bûne û Şîroveya Wan

An Analysis of Selected Words Considered to Have Originated in Kurdish and Transferred into Arabic

Halis DEDE

<https://orcid.org/0000-0003-2388-5406> | halis.dede@usak.edu.tr

Dr. Öğr. Üyesi, Uşak Üniversitesi, İlahiyat Fakültesi, Temel İslam Bilimleri Bölümü, Arap Dili ve Belagati Anabilim Dalı, Uşak, Türkiye

ROR ID: <https://ror.org/05es91y67>

Jêgir Citation Atıf	Dede, H. (2025). Kürtçeden Arapçaya geçtiği düşünülen bazı kelimeler ve tahlilleri. <i>Artuklu Kurdology</i> (20) 45-66 https://doi.org/10.35859/artuklukurdology.1767975
Dîroka Şandinê Submission Date Geliş tarihi	19.08.2025
Dîroka Qebûlê Acceptance Date Kabul Tarihi	27.09.2025
Dîroka Weşandinê Publication Date Yayın tarihi	30.09.2025
Cureyê Gotarê Article Type Makale Türü	Gotara vekolinê Research article Araştırma makalesi
Hakemî Peer-Review Hakemlik	Cot Nenas – Du ji derve Double anonymized - Two External Çift Taraflı Kör Hakemlik – İki hakem
Beyana Etîk Ethical Statement Etik Beyanı	Hatîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etîk hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin. Ragihandina Etîkê: jms@artuklu.edu.tr . <i>It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.</i> Ethical notification: jms@artuklu.edu.tr Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir. Etik Bildirim: jms@artuklu.edu.tr
Kontrola İntihalê Plagiarism Checks Benzerlik Kontrolü	Belê – İntihal.net Yes – İntihal.net Evet – İntihal.net
Nakokiyên Berjewendiyan Conflicts of Interest Çıkar Çatışması	Di gotarê de di navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendiyê tune ye. <i>There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.</i> Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.
Alîkarîya Darayî Grant Support Maddi Destek	Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê vekolinê ti fonên derveyî wernegirtine. <i>The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.</i> Yazar(lar), bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.
Mafê Telifê & Destûr Copyright & License Telif Hakkı & Lisanslama	Nivîskar li jer lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin. <i>Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0.</i> Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.
Polîtîkaya Hişê Çêkirî AI Policy Yapay Zeka Politikası	Nivîskar beyan dîkin ku di nivîsîna gotarê de alîkarîya HÇ wernegirtiye. <i>The author(s) declares that they have not used AI in producing this paper.</i> Yazar(lar) bu makalenin yazımı aşamasına YZ kullanmadıklarını beyan eder.

* Bu çalışma, “3. Bilsel International Korykos Scientific Researches And Innovation Congress” 07-08 September, 2024 - Mersin/Türkiye” sempozyumunda sunulan “Arapçaya Geçmiş Bazı Kürtçe Kelimeler ve Tahlilleri”

Agahiyên Îndeksan

Indexing

Dizinleme Bilgisi

DOAJ, MLA, ErihPlus, Linguistic Bibliography, EBSCO, ProQuest

Kurte

Tiştekî xwezayî û ji rêzê ye ku her zimanê ku li ser erdê pê tê peyivîn bi taybetî jî yên ku li derdora hevdu ne- bi zimanekî din re têkiliyê datîne û her yek jî wan tesîrê li yê din dike. Ziman bi vî hawayî berfireh dibin û dikemilin. Zimanê Erebi bi xwe jî vê têkiliyê bêpar nemaye. Yek jî wan zimanên ku Erebi pê re ketiye têkiliyê zimanê Kurdî ye. Ji bo ku hin herêmên ernîgariya ku Erebi lê tê axaftin bi Kurdî re yan cîran in yan jî di nav hevdu de ne tê gotin ku Erebi hin peyv ji Kurdî girtine. Ji ber ku di Erebi de tune ne peyvên Kurdî yên ku tîpên weke “p, j û g” di xwe de dihevinîn piştî derbasî Erebi bûne li gor struktûra Erebi hatine guhertin. Hin peyvên ku tê bawerkirin ku ji Kurdî derbasî Erebi bûne: birêde/البريد, gizêr/الجزر, ce‘de-جادة, xencer / خنجر (xun-çır), teng/ضنك û gasin/gêsin-الباسن. Di vê xebatê de hewl hate dayîn ku tesbîta hin peyvên ku tê bawerkirin ku ji Kurdî derbasî Erebi bûne bê kirin. Li ser raveka van peyvên hatiye sekinandin û wateya wan hatiye dayîn. Gotina *çavkaniyên* klasîk yên Erebi ku gotine, raveka filan peyvê ‘ecem/mu‘reb e, di hîlbijartina peyvên de li ber çavan hate girtin. Berawirda wan a Kurdî, taybetiya wan a struktûr û qalibê wan ê wateyî bi metodeke berawirdkirî hatiye analîzkirin. Bi saya vê metodê hatiye *şirovekirin* ku peyv li gor kîjan pîvanê ne ji Farisî û hwd lê belê ji Kurdî derbasî Erebi bûne. Bi vî awayî mîna keke berbiçav hatiye dayîn ji bo hevtêkiliya zimanan. Qest jî vê mînakê jî ew e ku gotin bi awayekî rast û durust bê watedarkirin û famkirin. Armanca vê yekê jî ew e ku hem di zimannasiyê de hem jî di xebatên wergeranê de nêrîneke baş bide mirov. Lêkolîn bi vî aliyê xwe tenê naxwaze alîkariya zimanê Erebi û belaxeta wî bike, di heman demê de dixwaze alîkariya beşên weke zanista zimanan ya berhevkirî û wergêranê jî bike. Tê bawerkirin ku tesbîta têkildariya di nava zimanan de û li gor vê têkiliyê daxuyandina guherînên di asta peyvên de hem di ferhangan de hem jî di hînkirina ziman dê bibe *çavkaniyek* referansî.

Peyvên Sereke: Zimanê Erebi û Belaxeta Wî, Ziman, Erebi, Kurdî, Têkili

Xalên Sereke

Ji bo her zimanekî ku li erdê tê gotin, bi taybetî wan ku li nêzîkî hev in, têkiliya hev kirin, ser hev xebitandin û jî hev tê xebitandin, têbînîyekî xweş e.

Bikaranîna fireh a erebi û axaftina wê li herêmekî mezin, têkiliya wê bi zimanên cuda neçar û bêjî ye.

Lêkolînên vekirî diyar dikin ku çavkaniya hin peyvên ên lêkolînkirî pir wisa tê ku bi Kurdî be.

Bi encamê, nimûneyên ku di vê lêkolînê de hatine gotin, tenê nasnameyên peyvên bi tenê ne; ew her weha nîşaneyên rastî û sistematîk in ku têkiliya dirokî ya di navbera Kurdî û Erebi de nîşan dide.

Abstract

It is a natural phenomenon for every language spoken on earth—especially those in close proximity—to come into contact, influence, and be influenced by other languages. In this way, languages complement and develop themselves. Arabic has also naturally been subject to such interaction, and one of the languages it has interacted with is Kurdish. Due to its geographical adjacency and intertwined use with Kurdish in certain regions, Arabic is said to have borrowed some words from it. In adopting these words, Arabic replaced certain letters not present in its own phonetic system, such as p, j, and g, thereby adapting them to its linguistic structure. Some of the words reported to have entered Arabic include: birêde (البريد), gizêr (الجزر), ce‘de (جادة), xencer (خنجر, “xun-çır”), teng (ضنك), and

gasin / gêsîn (الْبَاسِنُ). This study seeks to identify certain Kurdish words thought to have been incorporated into Arabic, examine their roots, and present their meanings. In doing so, it aims to provide a concrete example of linguistic interaction, enabling expressions to be interpreted and understood more accurately. The purpose is to offer a valuable approach not only for linguistics but also for translation studies. In this respect, the research aims to make a noteworthy contribution not only to the field of Arabic Language and Rhetoric but also to comparative linguistics and translation studies. In this respect, the research aims to make a noteworthy contribution not only to the field of Arabic Language and Rhetoric but also to comparative linguistics and translation studies. Identifying cross-linguistic influences and demonstrating the changes such contact brings about at the lexical level is expected to serve as a significant reference for both lexicographical work and language teaching.

Keywords: Arabic Language and Rhetoric, Language, Arabic, Kurdish, Interaction

Highlights

It is a natural phenomenon for every language spoken on earth, especially those in proximity to another, to come into contact, to influence, and to be influenced by it.

The widespread use of Arabic and its being spoken across a vast geography has made its interaction with different languages inevitable.

The analyses clearly demonstrate that the origin of some of the examined words is highly likely to be Kurdish.

In conclusion, the examples discussed in this study are not merely isolated word identifications; they also serve as concrete and systematic indicators of the historical interaction between Kurdish and Arabic.

Öz

Veryüzünde konuşulan her dilin, özellikle çevresinde bulunan bir diğer dille etkileşime girmesi, onu etkilemesi ve ondan etkilenmesi tabii bir durumdur. Bu şekilde diller kendilerini tamamlar ve gelişirler. Arapça da doğal olarak bu etkileşime tabi olmuş ve etkileşimde bulunduğu dillerden biri Kürtçe olmuştur. Arapça bulunduğu coğrafyanın bazı bölgelerinde Kürtçeyle iç içe ve komşu olması hasebiyle ondan bazı sözcükler aldığı ifade edilmiştir. Bu sözcüklerin bazılarını, bünyesinde bulunmayan p, j ve g gibi harflerini değiştirmiş ve kendi dil yapısına uygun hale getirmiştir. Arapçaya geçtiği ifade edilen sözcüklerden bazıları: birêde/الْبَرِيد, gizêr-الْجَزَرْ, ce‘de-جادة, xencer / خنجر (xun-çır), teng/تنك ve gasin/gêsîn-الْبَاسِنُ kelimeleridir. Bu çalışmada Arapçaya geçtiği düşünülen bazı Kürtçe kelimeler tespit edilmeye çalışılmış, bunların kökleri incelenmiş ve manaları sunulmuştur. Kelimeler seçilirken özellikle klasik Arapça kaynaklarda ‘acem/mu‘arreb kökenli olarak gösterilen sözcükler dikkate alınmış; bunların Kürtçedeki karşılıkları, yapısal özellikleri ve anlam boyutları karşılaştırmalı bir yöntemle analiz edilmiştir. Bu yöntem sayesinde, hangi ölçütlere göre bir kelimenin Farsça vb. dillerden değil de Kürtçeden Arapçaya geçmiş olabileceği değerlendirilmiştir. Böylece diller arasındaki etkileşimin somut bir örneği verilerek ifadelerin doğru bir şekilde anlamlandırılması ve anlaşılması sağlanmaya çalışılmıştır. Bunun, hem dilbilim hem de çeviri çalışmaları açısından iyi bir yaklaşım ortaya koyacağı hedeflenmiştir. Araştırma, bu yönüyle yalnızca Arap Dili ve Belâgati açısından değil, aynı zamanda karşılaştırmalı dilbilim ve çeviri bilim alanları açısından da dikkate değer bir katkı sunmayı hedeflemektedir. Diller arası etkileşimin tespiti ve bu etkileşimin kelime düzeyinde ne gibi değişikliklere yol açtığının gösterilmesinin, hem sözlüklere hem de dil öğretimine yönelik çalışmalarda önemli bir referans kaynağı niteliği taşıyacağı düşünülmektedir.

Anahtar Kelimeler: Arap Dili ve Belagati, Dil, Arapça, Kürtçe, Etkileşim.

Öne Çıkanlar

Yeryüzünde konuşulan her dilin, özellikle çevresinde bulunan bir diğer dille etkileşime girmesi, onu etkilemesi ve ondan etkilenmesi tabii bir durumdur.

Arapçanın yaygın bir kullanım alanına sahip olması ve geniş bir coğrafyada konuşulması, farklı dillerle etkileşim içinde bulunmasını kaçınılmaz hale getirmiştir.

Yapılan incelemeler açıkça ortaya koymaktadır ki, incelenen bazı sözcüklerin kökeni kuvvetle muhtemel olarak Kürtçedir.

Bu çalışmada ele alınan örnekler yalnızca münferit kelime tespitlerinden ibaret değildir; aynı zamanda Kürtçe ile Arapça arasındaki tarihî etkileşimin somut ve sistematik göstergeleridir.

Giriş

İnsanoğlu, başkalarıyla iletişim halinde olan sosyal bir varlık olarak yaratılmıştır. Bunun gereği olarak insanlar, birbirleriyle bağlantı kurmaktadır. Her bir bireyin ortak ve özel nitelikleri vardır. Yaşanılan şehir, bölge veya ülke bazında düşünüldüğünde özellikle farklılıklar ve özel hususiyetler söz konusu olmaktadır. Bu farklılıklar karşısında sağlıklı bir iletişim kurabilmenin en etkili aracı olan dil devreye girmektedir. Nitekim Kur'an-ı Kerim'de geçen *وَمِنْ آيَاتِهِ خَلْقُ السَّمَوَاتِ وَالْأَرْضِ وَاخْتِلَافُ اللَّسَانِ وَالْوَلَانِ* "O'nun kanıtlarından biri de, gökleri ve yeri yaratması, dillerinizin ve renklerinizin farklı olmasıdır. Kuşkusuz bunda bilenler için ibretler vardır." (*Rûm*, 30/22) ayeti, insanoğlunun sahip olduğu dil ve renk farklılığına işaret ederken, *يَا أَيُّهَا النَّاسُ إِنَّا خَلَقْنَاكُمْ مِنْ ذَكَرٍ وَأُنْثَىٰ وَجَعَلْنَاكُمْ شُعُوبًا وَقَبَائِلَ لِتَعَارَفُوا* "Ey insanlar! Şüphesiz sizi bir erkek ile bir dişiden yarattık, tanışasınız diye sizi kavim ve kabilelere ayırdık, Allah katında en değerli olanınız O'na itaatsizlikten en fazla sakınmanızdır. Allah her şeyi hakkıyla bilmektedir, her şeyden haberdardır." (*Hucurât*, 49/13) ayeti de tanışıp iletişim kurma halinde olmaya işaret etmiştir.

Bu çerçevede, sosyal bir varlık olan insanın kullandığı dil de sürekli bir iletişim ve etkileşim süreci içindedir. Arap dili, geniş bir coğrafyada kullanılmakta olup, Suriye ve Irak gibi bölgelerde hem aynı çevrede hem de komşu coğrafyalarda konuşulan dillerle etkileşim içindedir. Bu yakınlık ve iç içe geçmişlik, doğal olarak diller arasında kaynaşmaya yol açmış ve bazı kelimelerin karşılıklı olarak alınmasına vesile olmuştur.

Burada belirtilmesi gereken önemli bir husus, akla gelebilecek herhangi bir varlık için bir, birkaç ve bazen çok sayıda kelimeye/kavrama sahip olan Arapçanın bu özelliğiyle son derece geniş ve zengin bir dil olmasına rağmen başka dillerden niçin kelime aldığıdır. Buna Arapçanın, sadece isim bazında sınırlı sayıda müfred kelime aldığı cevabı verilmiştir. Bunların ekseriyeti de camid (türevi olmayan) olan *خَزَ ipek*, *إِبِكْ elbise*, *إِسْتَبْرَقْ parlak atlastan yapılmış elbise*, *پَنْزَهَرِ panzehir*, *her derde deva ilaç* ve *قَالُودَج bal ve undan yapılan bir tatlı* gibi isimler olup Persler ve Romalılar gibi başka milletlerde bulunan nesnelerin adları olduğu söylenmiştir (el-Cundi, 1982, s. 10/14).

Arapçanın etkileşimde bulunduğu dillerden biri de Kürtçedir. Çünkü bu iki dilin mensupları tarih boyunca dinî, kültürel ve coğrafi bağlar kurmuşlardır. Özellikle Türkiye'nin doğu ve güneydoğusu, İran'ın batı ve kuzeybatısı, Suriye ve Irak'ın kuzeyi gibi bölgelerde yoğun olarak yaşayan Kürtlerin konuştuğu (Akbaş, 2019, s. 115) Kürtçeden Arapçaya bazı kelimeler geçmiştir.

Bu çalışmada, Kürtlerin coğrafi konumuna ve Kürtçe hakkında genel bilgilere yer verildikten sonra Arapçaya geçmiş olan Kürtçenin Kurmancî lehçesine ait bazı kelimeler tespit edilip incelenmiş ve sistematik biçimde sunulmuştur. Kürtçenin diğer lehçeleri çalışmanın kapsamı dışında bırakılmıştır. Meselenin daha iyi kavranabilmesi amacıyla aşağıda Kürtçe üzerine bazı genel bilgiler sunulacak, ardından asıl konuya geçilecektir.

Kürtçe, dünyada yaklaşık 40 milyon kişinin konuştuğu, Hint-Avrupa dil ailesinin İranî koluna bağlı bir dildir.¹ Kendi içerisinde Kurmancî, Goranî, Lurî ve Kelhûrî diye dört ana kola ayrılmıştır (Adak, 2019, ss. 131-132). Bunlardan en yaygını Kurmancî olup Türkiye, İran'ın kuzeybatısı, Ermenistan, Irak'ın kuzeyi ve Suriye'de konuşulmaktadır. Goranî/Soranî² Irak ve İran'ın orta-güney bölgelerinde;

1 Hint-Avrupa dilleri Asya ve Avrupa olmak üzere iki ana kola ayrılır. Avrupa kolu Cermen (İngilizce, Almanca, İskandinav dilleri), Roman (Fransızca, İspanyolca, İtalyanca vb.) ve Slav (Rusça, Bulgarca, Lehçe vb.) dillerinden oluşur; ayrıca Yunanca, Arnavutça, Litvanca ve Keltçe de bu gruba dâhildir. Asya kolunu ise Hint-İran dilleri oluşturur. Hint kolunda Sanskritçe, Urduca, Hintçe, Bengalce gibi diller; İran kolunda ise Eski Farsça'dan türeyen Farsça, Avestaca, Peştuca, Osetçe ve Kürtçe yer alır. İranî diller kuzey, batı, güney ve doğu olmak üzere dört gruba ayrılır; Kürtçe kuzey-batı, Farsça ise güney-batı grubuna dâhildir. Bk. (Ciwan, 1992, s. 17)

2 Günümüzde Kürtçe lehçeleri genellikle şu şekilde sınıflandırılmaktadır: Yukarı Kurmancî, Aşağı Kurmancî (So-

Lurî, güney İran ve kısmen Irak'ta; Kelhûrî ise Irak ve İran Kürdistanı'nın güneyinde kullanılmaktadır. (E. C. Bedir Han & Lescot, 1990, s. 1; Selîm, 2013, s. 56).

Kürtçenin bu tasnifi ilk kez Şeref Han'ın (ö. 1012/1603-1604) 1597³ tarihli *Şerefnâme*'sinde yapılmış ve modern dilbilimsel sınıflamalarla büyük ölçüde örtüşmüştür. Ancak dikkat çekici bazı farklılıklar da mevcuttur. Modern dil sınıflamalarında genellikle üç ana kol (Kurmançça, Goranca-Zazaca ve Lurca) şeklinde yapılmıştır (Adak, 2019, s. 132). Şeref Han Kelhûrca'yı ayrı bir dal olarak göstermiştir. Ayrıca onun Yukarı Kurmançça ve Aşağı Kurmançça ayrımı günümüzde Kuzey Kurmançça (Kurmançî) ve Soranca biçiminde adlandırılmıştır.⁴ Şeref Han, Zazaca'yı doğrudan belirtmese de Goranca ile birlikte ele alması, modern sınıflamalarla uyumludur. Bu çeşitlilik, Kürt dilinin tarihi ve sosyolengüistik yapısını anlamada önemli bir bakış açısı sunmaktadır (Adak, 2019, s. 132, 1971, s. 22).

